



Dr. Nûredîn Zaza
1919 - 1988

NEWROZ



Osman Sebrî
1905 - 1993

Xebat ji bo :

- * Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
- * Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
- * Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.

Ji weşanên Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd li Sûriyê

Hejmar (144)

Sal 25 15ê Avrêl 2020 z - 2632 k Êmêl : Newroz@yek-dem.com

Buha (100)L.S

ROJNAMA NEWROZ Û YOBÎLA ZÎVÎN



Nûrdîn Zaza
1919 - 1988

NEWROZ



Osman Sebrî
1905 - 1993

Nûrdîn Zaza
1919-1988

**Ma mirov zaroyê xwe yê nexweş
bi zaroyê cîran yê nexweş diguhêre ?!**

Osman Sebrî
1905-1993

Ji Ji belavokên P. Yekîtiya li parêzgeha Helebê -Suriye

Ehmedê Xanê

Hejmar (1)

Nîsan û gulan 1995 an

Biha(10) P.S

(NEWROZ) ?

Çima rojnameya NEWROZê ?

Mezinan gewrî li xwe zîwana kirine û her tim gotine, ziman kiltî e, navnîşan e. Şert e û ji şertên hebûn û tunebûna mîletan e. Lewre, li zimanê me

û dûz bibe . Di nav gelê me yê kurd de , li Sûriyê bikanîna zimanê dê, di warê xwendinê û nivîsandinê de, kêr zêde li cîve Lê gelê Ma cî girtîve

**Sala 1995 – an
Sêsed saliya “Mem û Zîn”a E. Xanî ye.**

Weke hûn dizanin , ku bi boneya sêsed saliya

Desteya sernivîser

Xwendevanên Zimanê Kurdî û Rojname Newrozê yên qedirbilind, vaye /25/sal di ser weşandina R.N re diqedin û Newroz hîn di derçûna xwe de bedewam e. Vêca, piştî ewqas sal ji kar û xebateke bê sekin

bi zimanê dayîkê; Em dixwazin vê xebata dîr û dirêj û tijî kefteleft, ji damezrandina wê ve bigir û ta roja îro, movik bi movik bi we re parve bikin. Yanê, çawa çêbû? Kî pê rabû? Armanc jê çi bû? Çi kend û kelem li pêşiya wê derketin? Nivîskarên wê kî bûn?

Çend hejmar jê ta niha ronî dîtine? Mijar û naveroka wê, li ser çi bûn? Çalakî û xebatên serke, ku di bin navê wê de hatine kirin çi bûn?... Li dawîyê nixandî û pîvana encamdan û erênî û neyênîya wê jî, emê ji we xwendevanên dilsoz re bihêlin.

Damezrandin:

Li destpêka sala 1995 an, giropek ji dilhezên Zimanê Kurdî (Dr. Mihemed Ebdo Elî, Osman Mihemed, Mustefa Tatoz, Edîb Ibrahîm û Qaziqlî Mihemed «Bavê Leheng») - piştî bidawîkirina korsa rêzimên a bi serpereştiya ②

Kesrayê Cegerxwîn Ji nav me bar kir

Desteya NEWROZê

Roja Pêncşembê 26ê meha Avdarê 2020Z, li Stokholmê, bi encama nexweşiya Korona ya malmîrat, dilê mamoste Keyo, kurê helbestvan û xebatkarê Kurd ê navdar Seydayê Cegerxwîn rawestiya û ji nav me bar kir.

Keyo ku mezinê malbata Cegerxwîn bû, kesayetiyeke siyasî û civakî cihê rêz û rûmeteke giran bû. Tevî ku ji mêj ve ye ew nişteciyê Swêdê bû, lê têkiliyên wî bi welêt re nehatin birîn, her ku derfet çê dibû, ew û malbata xwe dihatin welêt, doşt, heval, hogir û hezkerên Seydayê Cegerxwîn didîtin

û demeke xweş dibuhartin. Sed mixabin, ji ber belavbûna vê êşê, piştî 21 rojê ji mirina wî, ango roja 16ê Gulana 2020an, bi beşdariya hindik kes û mirovan, li Stokholmê termê wî sipartine axê. Bi vê bûneya xemgîn û dilêş, NEWROZ sersaxiya malbata Cegerxwîn, û hemî hezkerên Keyo dike. Bila



cihê wî bihuşta berîn be.

Rojnama ... Dûmahîk

Dr. Ebid Mecîd Şêxo, û bi şêwir û mişêwir bi wî re, tekez kirin, ku gerek xebata bo zimanê kurdî nesekine, karek were kirin, da ku, xebat û gotinên pêşewên Kurdan, ên mîna mîrê hebesta kurdî» Ehmedê Xanî», mîrê alfebe û rêzimanê kurdî» Celadet Bedirxan», û zimanzan û siyestmedarê Kurd «Dr. Nûredîn Zaza» û yên weke wan li erdê nemîne. Li dawiyê, ew bi hev re gihîştin rayekê, ku pêdivî bi weşaneke kurdî heye.

Hevdîtina yekê ji bo derxistina belevokeke kurdî, li destpêka Buhara wê salê, li ser bêdera «Gundê Tilifê»- Efrîn, bi pakrewan «Kemal Henan» - wek endamê Komîta Rêvebir a Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd - re bû. Piştî wê hevdîtînê, li ser derxistina weşaneke kurdî di bin navê partiyê de û li ser asta Parêzgeha Heleb erê bû.

Navlêkirin û derçûna hejmara yekê:

Li Nîsana heman salê, civatek bi beşdariya Dr. Mihemed Ebdo Elî, B. Leheng, Osman Mihemed, Edîb Ibrahîm, Kemal Henan û serpereştiya mamoste Mihyedîn Şêx Alî li Suryana kevin hate lidarxistin, piştî danûstandineke berpirsiyarane, ev biryar hatin standin:

1- Navê belavokê Newroz be. Ji ber ku,

Newroz navê cejna netewî ye, navekî li ber dilên Kurdan pir buha ye, û wateya roja nû, Aştî, Azadî û wekhevîyê dide.

2- Weşan duheyvane be.

3- Naveroka wê çandeyî, dîrokî û civakî be.

4- Hejmara yekê, divê di /22/ê Nîsanê -Roja Ronamegeriya kurdî - de derkeve.

5- Armanc ji deranîna vê weşanê, fêrkirin û ragihandina heşt, raman, boçûn û derbirînan bi zimanê dê ye, û xwedîderketin li bangewaziyên rêberên zimên e.

6- Desteya birêvebirinê, ji ew kesên beşdar, û bi serpereştiya Dr. E.M.Ş pêk tê.

7- Sergotar jî bi mamoste «Şêx Alî» hate hilpesartin.

Hejmar û naverok:

Hejmara yekê ji R.N li 22.4.1995 derçû û hejmara wê ya niha jî gihaye /144/ an. Her deh hejmarên pêşîn li ser asta parêzgeha Heleb bûn, û naverok jî çandî, dîrokî û civakî bûn. Piştî wê, (R.N) bû weşanek ji weşanên partiyê bi giştî. Herweha, nêrînên azad û gotarên siyasî jî li naveroka wê zêde bûn. Yanê, em kanin bibêjin, ku cara yekê bû, ku di nav ronamegeriya Tevergera Kurdî de, siyaset bi zimanê kurdî hate nivîsandin û xwendin.

Desteya sernivîser û pênuşên wê:

Desteya Rojnamê pir weke xwe nema, mamoste «Edîb» dev jê berda û

çû Almaniya, piştî deh hejmara Dr. Mecîd jî xatir xwest, lê, Dr. «Kamîran Hec Ebdo», Newaf Bişar Ebdela, gorbihuşt Mustefa Ellaş (Felat Sirûcî) bûne endam, û di salên paşê de jî, Nûşîn Bêcirmanî, Dilovanê Deştê, Ehmed Erefat û gorbihuşt Mihemed Zekî (Diljar Seyda) tev desteyê bûn. Lê, Dr. Kamîran jî pir dirêj nekir û çû Almaniya. Bi vê şêweyî, ta dawiya sala 2012an berdewam kir. Di dû re, du salan rawestîya, paşê dîsa li destpêka sala 2015an, bi rêvebirina desteya berê (ji bilî Osman Mihemed û lêzêdebûna mamoste Merwan Berekat, Mihemed Qere Hesên û Ehmedê Qitmê wek nûçegîhan) ta dagîrkeriya Efrînê dirêj kir. Ji wê hîngê ve û ta niha jî, li «Qamişlo» û bi serpereştiya endamên desteyê yên Cezîrê tê der.

Nav û nehînavên Nivîskarên rojnamê ev in:

Mihyedîn Şêx Alî (Sînorê Yekta), Dr. Ebid Elmecîd Şêxo (Dilşad Sindî), Dr. Kamîran Hec Ebdo (Kamîran Bêkes), Dr. Mihemed Ebdo Elî (Dr. Rozad Elî), Pakrewan Kemal Henan (Hesenê Cûmê), gorbihuşt Edîb Ibrahîm, Osman Mihemed (Apê Osnebir, End. Çîwazê Çeman), Qaziqlî Mihemed (End. Q. Kurdaxî, B. Leheng, Memê Alan), Merwan Berekat, Ehmedê Qitmê, Mihemed Qere Hesên (Zamdarê Zindî),

Newaf Bişar Ebdela (Rêberê Silîvî, Serdar Bedirxan), Nûşîn Bêcirmanî, Derwêşê Xalib, Dilovan Deştê, Ehmed Erefat, gorbihuşt Mihemed Zekî (Diljar Seyda) Heyder Omer, Mihemed Birîmce, Kemal Ebdalo, Konê Reş, M. Mehfûzê Mele Silêman, Derwêşê Xalib, gorbihuşt Mistefa Elaş, Salih Mamo, Arif Hiso, Mislim Şêx Hesên, Seyfedîn Dabo, Osman Îso, Ebid Elrehman Mihemed Hesên, Dr. Leheng Mihemed, Dr. Memo Ebdê, Şukrî Dedo, Ebdîn Bakîr, gorbihuşt Salih Bozan, gorbihuşt Mustefa Tatoz, helbestvan Adil korana (Doştê Cûmê), helbestvan Arif Mihemed Elî (Arif Tisorî), helbestvan Xalid Xilo (Baranê Cûmê), Mustefa Henan, ... H.W.D bi pênuşên xwe yên nikil zêrîn, rûpelên Newrozê xemilandin û giyana berdewamiyê pê de berdand, û ger me navin ji bîr kiribin jî, bila xwediyê wan navan li me biborînin.

Jinên Kurd ên di NEWROZê de nivîsandine ev in:

Melek Mûrad (Enehîte Mûrad), Zevîfet Henan (Vejinê Kurd), Nezîre Hesên (Nazdar Hesên), Zozan Eslan Ebdo, îlhama Osma, Zelûx Cimo (Diya Leheng).

Herweha cefaya Şukrî Dedo a bêtirî 10 salan e di warê derhênan û weşandina NEWROZê de **3**

Pîrozbahî

Arif Hiso



Bi derbasbûna 25 salan ji derketina rojnama NEWROZÊ ya ku bi wêneyên herdû


zimanzanan Dr. Zaza û apê Osman hatiya xemilandin, yekem rojnameya siyasî li Sûriyê tê weşandin, û ew li cem kesên ziamanhez û welatperwer, cihê rêzgirtin û kêfxweşiyê ye.

Hêja ye ku em bêjin roleke wê erênî di pêşketina civakê de hebû û hê jî heye. Herweha pêwişte em ji xwe bîr nekin ku destiya wê ya sernivîser kedeke ne hesanî pêşkêş dike, ji nivîsandin,



lêveger û lêhûrbûnê, ta digihê çapkirin û weşandinê.

Hêviya berdewamî û serkeftinê ji wan re



dixwazim. Sipas ji hemû kesên ku di NEWROZÊ de xebitîne pîrozbahiyê wê xwendevanên wê dikim.

Rojnama ... Dûmahîk

mayê jibîrkirin.

Kar û çalakîyên sereke:

Di vî warî de, gelek kar û çalakî bi navê Newrozê, yan jî bi alîkariya wê, di karnava van «25»salên borî de hatin kirin. Ji nav wan ên balkêş ev in:

1- Beşdarbûna li damezrandina xelata «Apê Osman Sebrî» - Şam.

2- Beşdarbûna salane li xelatkirinên bi navê «Nûredîn Zaza»- Şam.

3- Beşdarbûn li gelek civatên hevbeş ên sudejihevgirtinê yê rojname û kovarên bi zimanê kurdî, ku li Sûriyê dihatin der.

4- Têkeliyên biratî û digel gelek karên hevbeş bi weşana « Deng »re.

5- Şandina namakhevbeş di gel weşana «Deng», ib o yekirina alfebeya kurdî, ji kek «Mesûd Berzanî» re.

6- şandin û xwendina gelek nameyan, di boneyên

sersaxî û bîranîn de.

Bi kesayetên siyasîmedar, nivîskar û rewşenbîran re, gelek hevdîtin hatin çêkirin, ji w a n :

A- Gorbihuşt Mihemed Nezîr Mustefa/Sekreterê PDKS.

B- Gorbihuşt Hemîdê Hec Derwêş/Sekreterê Patiya Pêşverû, du caran, û di du hejmaran de.

C- Nesrdîn Ibrahîm/ Sekreterê PDKS.

Ç- Kevintrîn Kowara HAWARê, Erefatê Ezem, li Tirbespiyê.

D- Xebatkarê Kurd ê navdar û gorbihuşt Ehmedê Yasîno li gundê Babasiyê

E- Siyasetmedar û mafnasê Kurd ê Bakurê kurdiştanê Ibrahîm Goçlû.

Ê- Nivîskar, helbestvan û romanivîsê Kurd ê Bakurê Kurdiştanê Riza Çolpanê Dêrsimî, Australya-Sydney.

F- Nivîskar û

hunermendê Kurd ê Bakurê Kurdiştanê Lewendê O s k a n .

G- Kesayetiya siyasî û civakî Samî Mele Ehmedê Namî, Siwêd-Stokholm.

Em kanin bibêjin bi pêşinyar, alîkarî û serkêşiya Desteya sernivîser a Newrozê û hin nivîskarên wê jî, li Buhara sala 2005an, Saziya Fêrkirin û Paraştina zimanê kurdî hate damezrandin. Û di bin serpereştiya wê de jî, bi hezaran şagirt hatin fêrkirin, û gelek mamoste, nivîskar, helbestvan, çîroknivîs û romanivîs çêbûn, û ta niha jî berdewam e.

Kend û kelem:

Ji hejmara yekê de bigir û ta hejmara /144/an, kendên derdiketin pêş tim hew hew bûn, kêmbûna xwendevan û nivîskaran (mijaran), û neliserhevbûna herwest a desteya sernivîser. Sedemên derketina wan keleman, aloziyên jiyana

xelkê Sûriyê bi tevayî, xwebexşbûna kar, tunebûna teknîkên pêşketî, derfetên çapkirinê, qedexebûna kar û barên xwendin, nivîsandina zimanê kurdî û çapemeniyê, û kirîza Sûriyê ya herî bi badirtir bûn. Bi nêrîna me, di vê karnava demdirêj de, raşt e Newroz bi temamî ne li gor dilê me bû, lê, kanî bibûya kevirek di avahiya rojnamegeriya zimanê kurdî de, rolek di belavkirina zimanê kurdî de bilîsta, û herweha kanîbû heşt û raman û bocûn bi zimanê dê birêştana.

Hêviya me ew e jî, ku di rojên werin de, kanibe gavine ji berê pêşdetir bavêje. Xwendevanên bi rûmet, ya li cem me heye, me ji we re -wek heye - anî zimên. Û rexin û nirxandina dawîn jî li cem we dimînin. Bi hêviya ku, hûn pêşinyarên xwe yê pêşxistinê ji me re bişînin.

ji keç û xortên Kurd tê xwestin ko xwe hîn xwendin û nivîsandina hemû rengên zanîn û zanyariya kurdî bikin

Hevpeyvîn bi mamoste Samiyê Mele Ehmedê Namî re

Mamosteyê birêz Samî Mela Ehmedê Namî...

Bi helkefta derbasbûna 25 salan di ser derçûna weşana me ya bi zimanê Kurdî NEWROZ, li despêkê em xêrhatina we dikin, bi hêvî ne ku di vê hevpeyvînê de, hun tozê ji ser hin bûyerên dîrokî biweşînin, ji aliyê din ve jî, hin bîranînên Kurdewariyê ji xwendevanên NEWROZê û gelê me re bêjin.

Gelek bi xêr hatî, NEWROZ bi mêvandariya we pir şad û bextewer e.

Newafê Bîşar



1. Samî Mele Ehmedê Namî Kîye?!. Kurtejiyana wî çawa ye, çîberhemên wî yên çapkîrî û yên reşnivîs hene?.

Di sala 1939an de li gundê Tilşeîra Aşîta, qeza Qamişlo, li Rojavayê Kurdiştanê hatime dinyayê.

Min xwendina dibistana sereta li vî gundî bi dawî anî û digel hejmarek xort û kalên gund li dibistana fêrkirina zimanê kurdî ko bavê min Namî mamostê wê bû, hîn xwendin û nivîsandina kurdî bûm, ta ko min hejmarek ji hevalên xwe hîn xwendin û nivîsandina kurdî kirin.

Di sala 1952an de, malbata min li bajarê Qamişlo bi cî bû û min xwendina xwe ya navîn û bekelorya li wir kuta kir.

Paşî min li zanîngeha

Şamê li Kolêja Dadevaniyê du salên xwendinê bi dawî anîn. Mixabin bi sedema rewşa me ya aborî û desttengîyê, bivênevê bûm ko xwendina xwe li zanîngehê bi dawî bînim.

Di temenê xwe yê biçûk de, hiş û bîr û baweriyên min li kurdayetiyê vebûn.

Çiko bavê min nivîskar û helbestvan bû, herweha di nava hemû rêxistinên siyâsî de weke Civata Xoybûnê, Civata Arîkariyê ji Bûna Belengazên Kurd Li Cizîrê (Civata Hîşiça), Civata Azadî û Yekîtiya Kurdan û Nadiya Ciwan kurd Li Amûdê, endamekî çalak bû.

Û di nava malê de, digel xwîşkên xwe me guhdarîya helbestên bavê xwe dikirin û me hin ji wan jî ji ber dikirin.

Bi sedema ko di malê de ez kurek bi tenê û delalî bûm, gelek caran bi bavê xwe re di nava çalakiyên kurdayetiyê de beşdar dibûm û min bi vî awayî hejmarek siyasetvan û welatparêzên kurd didîtin û nas dikirin.

Di warê rêxistinî de û di sala 1950î de bûme

endamê Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Cihanê.

Di sala 1954an de Mihemedê Mela Ehmed, Samî Mela Ehmedê Namî, Evdilezîzê Eliyê Evdê û Drwêşê Mela Silêman, Civata Yekîtiya Xortên Demokrat ên Kurd Li Sûriya damezirandin.

Piştî damezirandina Partiya Demokrat a Kurd Li Sûriya û bi erêkirina bavê min Namî (Çiko Namî wek şewirdar bû ji Civatê re) û li gor daxwaza Doktor Nûredîn Zaza û Mam Celal Talebenî (dema ko li bajarê Qamişlo bûn). Damezirênerên Civatê biryar dan ko Civata Yekîtiya Xortan bibe beşek ji Partiya Demokrata Kurd û karê rêxistinî di nava refê partiyê de domandin.

Bi behana çalakiyên kurdayetiyê, gelek caran ez digel bavê xwe, yan bi tena xwe dibûme mêvanê zîندان, nemaza di sala 1959an de, dema ko serok û hejmarek mezin ji berpirsên komîta navendî û komîtên herêman û endamê partiyê hatin zîndan kirin û li zîndana Mezê û li ber



dadgeha Leşkerî ya Bilind li Şamê hatin dadge kirin, ku ez yek ji wan bûm.

Çalakîyên min di warê çanda kurdî de:

Ji demeke dirêj ve min dest bi nivîsîna kurdî kiriye û hejmarek gotar di kovar û malperên kurdî de weşandine.

-Di sala 2000î de, pirtûka min ya yekemîn, bi navê Dîmenin Ji Dîroka Winda li Stokholmê ji Weşanxanaya APECê ve hate çapkirin û weşandin.

-Pirtûka min ya duwemîn, bi navê Gulzara Mela Ehmedê Namî, anha li Stokholmê tê çapkirin.

Bavê min weke hemû rewşenbîrên kurd yên wê demê berhemên xwe yên bi zimanê kurdî bi tîpên erebî dinivîsîn.

Piştî koça dawî ya bavê min, berhemên wî yên destnivîs ko bi tîpên erebî bûn, min ew guhestin bo nivîsandina bi tîpên latînî ew jî ev bûn:

-Dîwana Helbestan ya bi navê Daxwazname, cara pêşîn li Stokholmê û ya duwemîn li welat hate çapkirin.

Hevpeyvîn ... Dûmahîk

-Pirtûka Agirê Sînema Amûdê li Stokholmê hate çapkirin.

-Ferhenga kurdî-erebî û erebî-kurdî bi navê Kozar. Min jî karekî ber bi çav di danehev û nijinandina gotinên ferhengê de kiriye. Hîna destnivîs e.

-Rêzimana kurdî û erebî ku ew jî destnivîs e.

-Jînenîgariya Namî û ew jî destnivîsa Ehmedê Namî ye.

Di sala 1959an de li navenda Kirîna Genim bûme karmend. Mixabin piştî sal û nîvekê ji kar û li gor biryara Wezaretê Hundur û desthilata dewletê ez ji kar hatim biderxistin.

Di sala 1961 ta sala 1992, bûme mamoste li dibistana taybet ya Kildan Katolîk û dibistanên fermî li bajarê Qamişlo.

Piştî 26 salan ko mamosta bûm û bi sedema ko hêzên ewlekariya dewletê û yên Partiya Be'es ez bivênevê bûm ko dev ji kar berdim û bûme xanenişîn.

Di sala 1999 koçberî welatê Swêdê bûm û aniha li bajarê Stokholmê dijîm.

2. Jiyana û bîranîna te li gundê Til Şîrê. Zarotî, xortanî, zimanê Kurdî, heştê netewî û xebata rêzanî (siyasî) û hwd...çi tê bîra te?.

Ez li gundê Tilşêrê hatime dinya, jiyana xwe ya zaroktiyê bi zarokên hevalên xwe re bi leystikên heme reng didomand û

xwendina xwe ya serete li dibistana gund ta sinfê pêncan bi xweşî derbaskir. Bi sedema ko dibistan li gundên dormadora Tilşêrê tune bû hejmarek zarokên gudndê Beyandor, Xotla Tilcehanê û Dekşûrî dibûne xwendevanên dibistana Tilşêrê. Mamostên

dibistanê ji bajarên Sûriya weke Şam, Humus, Hema û Helebê dibûne mamostên gund. Xwendin li dibistanê bi zimanê erebî bû ji ber ko di destpêkê de me bi zimanê erebî nedizanî, ji ber wilo em raştî gelek aştengan dihatin lê dîse jî bi rehetî di xwendinê de pêşve diçûn.

Ji min re du dibistan hebûn, yek jê xwendina li dibistana fermî bû, û ya din xwendina li malê bû ko bavê min hem alîkar bû ji min re bi dersên erebî û hem jî ez hînî xwendin û nivîsandina kurdî bi tîpên latînî dikirim, ta ko bi hesanî min dikarî bi kurdî bixwînim û binivîsim, û hejmarek helbestên kurdî yên Namî û yeke Qedrîcan ya bi navê Berzanî..Berzanî ji ber bikim, û hin caran bavê min ez bi xwendina hin tîxistiyên kovara Hawarê didame xwendin. Bi vî awayî çavên min li kurdayetiyê vebûn, weke rêxistin û çanda kurdî û di sala 1950an de digel hejmarek hevalên xwe bûme endamê Rêxistina Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Cihanê. Malika Tilşêrê.

3. Li ser kar û xebata Seydayê Mele Ehmedê Namî di warê wêje, ziman û rêzaniyê de, çi tê bîra we, hun dikarin çi bêjin?.

Ji dema zaroktoyê ve, min helbestên bavê xwe ji wî dibihîstin, êdî min dizanî ko bavê min helbestan dihûne, û dema min nivîs yan helbestên wî di kovara Hawar û Ronahiyê de diditin, min dizanî ko bavê min hem helbestvan û hem jî nivîskar e. paşî va ye em dibînin ko Namî helbesvan e xwediyê dîwana helbesta ya bi navê Daxwazname, û hem jî nivîskar e xwediyê pirtûka Agirê sînema Amûdê ye. Hem jî zimanzan e xwediyê Ferhenga kurdî-erebî û erebî-kurdî ye ya bi navê Kozar, û rêzimana kurdî-erebî û hem jî dîrokan e weke nivîsa wî ya bi navê Çiko Li Bîr im.

4. Wekî diyar e, Seydayê Cegerxwîn demekê li gundê Til Şîrê bi malîti maye, gelo rola wî di jiyana civakî, rêzanî û çandî de çi awayî bû?.

Di dema feqehtiyê de û piştî ko Seyda Şêx Brahîmê Sofî Evdê hicrika feqehan û xaniyê xwe li gundê Tilşêra Aşîta avakirin, hejmarek xwendevanên Hicrikê lê hêwirîn ji wan jî Feqe Şêxmûsê Hesarî (Seydayê Cegerxwîn) yek ji xwendevan Hicrikê bû, lê bi malîti rojekê ne bû nişteciyê gundê Tileîrê. Piştî dmeke kurt ji mana wî li hicrikê (weke du

mehan) û li gor biryara Seydayê Hicrikê û ji ber hin sedeman Seydayê Cegerxwîn ji hicrikê barkir û ber bi Kurdistanê ve bi rê ket, û nema vegeriya HicrikaTilşêrê.

5. Çi têkilî di navbera bihuştî Mele Ehmedê Namî û Mîr Celadet Bedirxan, Dr.Kamîran Bedirxan, Apo Osman Sebrî, Dr.Nûredîn Zaza, Qderî Can... û hemû nivîskarên Kovara HAWARê de hebûn?. Kesî ji wan nivîskaran seredana gundê Til Şêrê kiribû?.



Mele Ehmed Namî

Cara yekemîn bû ko Namî li bajarê Amûdê û li hicrika feqehan ya Seyda Mela Ubeydulla pêşwazî û hevnasîn bi Mîrê pênûsa kurdî Mîr Celadet Alî Bedirxan re kir, û ev nasîn bû dergehê tîkiliyê bi Mîr û kovara Hawar û Ronahî re. Êdî Namî helbest û nivîsên xwe di nava rûpelên zêrîn yên wan kovaran de diwaşand.

Namî yek ji şagirtên Mîr Celadet Bedir Xan bû, yên ko fêrkirina gel danîbûn ser milên xwe. 6

Hevpeyvîn ... Dûmahîk

Namî seydayê dersdar di dibistana şevê ya gundê Tilşeîra Aşîta de, xort û kalên gund hînî xwendin û nivîsandina kurdî dikirin.

Namî ji Celadet Bedir Xan re digot: Mîrê min. Her weha ew weke Mîrê Kurdiştanê didît, dema di helbesta xwe ya bi navê Daxwazname de dibêje:

Recûkar im Ji Mîrê xwe
Celadet

Wetenperwer, Xwedanê
text û dewlet

Namî di gotara xwe ya bi navê Mehkema Hawarê û Deyndarê Şermende, di dîwana helbestan ya bi Navê Daxwazname de dibêje:

Ez kurek ji kurên Hawarê
dihatim hesab kirin, û
min xizmetên gelekî
mezin jê re kiribûn...

Xizmetên Namî ji Kovara Hawarê re ev bûn:

a-Nivîskarekî kovara Hawarê û Ronahî bû.


Helbest û nivîsandinên xwe di nava rûpelên wan yê zêrîn de diweşandin.

b - B e r p i r s i y a r ê belavkirin û frotina hejmarên Hawarê û Ronahiyê bû.

c-Ji xwendevanên wê yê yekemîn bû.

d-Gelek caran Namî digel rewşenbîrên hevalên xwe yê ko li Cizîrê dijiyan weke Cegraxwîn, Osman Sebrî û Hesên Hîşyar, ji bo alîkarêya Mîr û çapkirina Hawarê dihatin Şamê.

h-Li xwendegeha hînkirina xwendin û



nivîsandina zimanê kurdî bi tîpên latînî li gundê Tilşeîra Aşîta ko Namî mamostê wê bo, naveroka kovara Hawarê û Ronahiyê ji xwendevanên xwe re dixwend.

-Dr. Kamîran Bedirxan, heval û dostê Namî bû. Gelek caran li bajarê Şamê hevûdu didîtin, û hem jî nivîskarê kovara Roja Nû bû. Mixabin piştî çûna Dr. Kamîran bo Ewropa, êdî têkilî û danûstandin di naberan wan de nema.

-Apo Osman Sebrî hevaleyê Namî bû, çiko bîr û baweriyên wan di warê tevgera siyasî hetanî aştêkê, nêzîkî hev bûn.

Li gel hev û hejmarek ji siyasîvanên kurd endam û berpirsiyarên hemû civat û komeleyên kurdî yê wê demê bûn. Herweha herdu helbestvan û nivîskar bûn, û hezkiriyên Mîr Celadet Bedir Xan bûn.

-Doktor Ehmed Nafîz û birayê wî Doktor Nûredîn Zaza, du havalên Namî bûn, û kirîvê hev yê xwînê bûn, lewra min û xwîşkên xwe ji wan re Apo digot.

Namî du helbest hûnandibûn, yek bi navê Pesnê Ehmed Namî Ji Serokê Bijîşk Ehmed

Nafîz re, di Reşbeleka wê de, û helbesta Ji Bo Apê Min Nûredîn Zaza ew jî weke nameyekê, bi rengê helbestê û li ser navê min Samî (Mişo) û jê re rêkiribû welatê Siwîsra.

Hevaltî, hezkirin û rêzgirtin di nav Dr. Nafîz û Dr. Zaza û Namî de, bi rojan xurtir dibû, ta çûne ber dilovaniya xwedê.

Mamoste Qedrican, Reşîd Kurd, Hesên Hîşyar, Mela Ehmedê Palo û Miftîyê

Qamişlo Mela Ehmedê Zivingîjî, dostên Namî bûn. Gelek sûde ji bîrûbawerî û dîtin û nivîsandinê hev didîtin.

-Ji nivîskarên Kovara Hawarê yê ko ziyareta gundê Tilşeîrê, li dema ko Namî li gund bû, Mîr Celadet Alî Bedirxan, Cegraxwîn Mîstefa Ehmedê Botî bûn.

6. Berî damezrandina PARTÎ li Rojavayê Kurdiştanê li sala 1957an, we çend xortên Kurd li Herêma Cizîrê Komeleke Ciwana çê kiribû, ew pêşniyara kê bû...Gelo, hun dikarin bi firehî li ser wê saziyê ji xwendevanên NEWROZê re biaxivin?.

CIVATA YEKÎTIYA

XORTÊN DEMOKRAT ÊN KURD LI SÛRIYA

Di 21.4.1954 an de, Civata Yekîtiya Xortên Demokrat ên Kurd li Sûriya, li bajarê Qamişlo hat damezirandin.

Damezirênerên Civatê:

Mihemed Mela Ehmed, Samî Mela Ehmed Namî, Evdilezîz Elî Evdê, Derwêş Mela Silêman, bûn.

Bernameya Civata Yekîtiya Xortên Demokrat ên Kurd li Sûriya 17 xal bûn, ji wan:

1-Civat, rêxistinêke siyasî, çandî û civakî ye (Yekemîn rêxistina siyasî bû piştî Civata Xoybûnê).

2-Komîteya Navendî wê serkêşiya Civatê bikê.

3-Rizgarî û yekîtiya kurd û Kurdiştanê.

4 - P ê k a n î n a demokrasîyê, da bibe sedema bidestxistina mafên kurdan yê netewî.

5-Rizgarkirina gelê kurd, ji zulm û zora empiryalîzmê û kevneperestîyê.

6-Di dibistana kurdî de bikaranîna bernameyekê ji bo xwendina bi zimanê kurd.

7-Piştgiriya jinên kurd beramber nexweşiyên civakî û yê kewdeniyê û azadkirina wê ji

Hevpeyvîn ... Dûmahîk

wan nexweşiyên.

Ji xebatên Civatê, pêwîst bû ko her endamekî Civatê, hînî xwendin û nivîsandina kurdî bibe.

Komîta bajarê Qamişloyê ya Civata Xortan, ahengek ji bo bîranîna damezirandina Komara Mehabadê ya bi serokatiya şehîdê nemir Qazî Mihemed lidarxişt. Her weha di sala 1955-1956an de Cejna Newrozê hate pîrozkirin.

Pirtûkek biçûk bi navê Bîlad El-Ekrad bi zimanê erebî û bi nivîsîna Samid Kurdiştanî hate çapkirin.

Di sala 1955an de Osman Sebrî digel hejmarek mezin ji alfabaya wî hatin girtin. Roja din Osman hate berdan û alfabe di zîndanê de girtî ma.

Lê hejmarê elfabayê ko li mala Ehmed Namî bûn nehatin girtin. Me jî ew bi alîkariya hevalan firotin.

7. Weke bûyerek dîrokî ku kêma agahiyên me li ser hene, dema hilbijartinên Parlemantoya Sûriya ku birêz Nûredîn Zazaber bijêrekî Kurd ê Partî bû. Çi hûrguliyên (تفاصيل) wê bûyerê di bîra we de mane?

HILBIJARTINA**SALA 1961an**

Di sala 1961an de, hikûmeta Sûriya biryara hilbijartina parlamaneke da. Dr. Nûredîn Zaza û Şêx Mihemed Îsa bûne kandîdatên Partî û gelê

Kurdê Sûriya.

Gelê kurd û partî, bi giştî piştgîriya herdu kandîdatên xwe kirin. Doktor û Şêx bi gera hevdîtina gel radibûn. Li bajarê Amûdê xortên kurdan otomobîla wan hildigirtin û di bin de meşiyên.

Berîya hilbijartinê bi çend rojan Dr. Zaza çû hevdîtinek bi Wezîrê Hundir û bi Serekleşkerê Sûriya re kir.

Berpirsiyarên rejîmê di bin fortan de doz li Dr. Zaza û Şêx Îsa dikirin ko xwe ji hilbijartinan vekişînin. Êdî mebahisan leşkerî ji Doktor re gotin: Eger tu beşdarî hilbijartinê bibî, wê tu û birayê te Dr. Ehmed Nafiz bêne girtin. Lê dîsa Doktor xwe ji hilbijartinê bi paşve neda.

Roja 29.11.1961an, Dr. Zaza û Şêx Îsa hatin girtin.

Roja 01.12.1961an, dengdanê dest pê kir. Lê ne tenê wek dengdan û hilbijartinê bû. Bêgoman bûbû mehrecan û cejin ji gelê kurd re.

Bi Dr. Zaza û Şêx Îsa re, hevalên berpirsiyarên sindoqên dengdanê jî hatin girtin yan jî ji hundirê odên dengdanê hatin derxiştin û bi zorkotekî sindoqên dengdanê bi dengên hevalên rejîmê hatin dagirtin.

Dengdan qediya û nav hatin jimartin, zilamên rejîmê bi serketin.

Roja siyemîn, Doktor û Şêx û hevalên berpirsiyarên

sindoqan ji girtîgehan hatin berdan, lê piştî çî?!

Dr. Zaza û Şêx Îsa rapora nerazîbûnê û nedurîstî û neqanûniya hilbijartinê ji Dadgeha Destûrî û Wezîrê Navxwe re rêkirin. Lê bê guhdan tev badîhewa çûn.

8. Sed mixabîn ku diho-pêr li Stokholmê birêz Kesrayê Cegerxwîn çû ber dilovaniyê Xwedê, em hemû xemgîn û dilê me bi çûna wî êşiya. Li gora ez dizanim, hun pir nêzîkî hev bûn, we ji hev hez dikir, gelo têkiliyên we ji mêj ve bi hev re hebûn? û bandora çûna Kesra li we çîye?

Mela Ehmedê Namî û Cegerxwîn du havalên feqehiyê bûn, li gelek hicrikên feqehan li bakur û rojavayê Kurdiştanê dixwendin ta ko bûbûn du melayên Duwazade Ilmî. Li hicrika Seydayê Mela Ubeydullah li bajarê Amûdê hevaltiya wan xweş û bihtir dibû. Di sala 1946an de Seydayê Cegerxwîn bi malîtî li bajarê Qamişlo bicî bû, tikişîya hevjin û zarokên wan jî bi rojan zêde dibû. Bi çûn û hatina malên hev hezkirinek bê sînor di navbera xelkê herdu malan de rû dida, zarokên wan bi rojan li malên hev dibûn mihvan.

Ez û Kesra di temenekî de bûn, û li bajarê Qamişlo bûne hevalên hev yê xwendinê, bi rojan li cem hev di nava nivînekê de radizan, em dibûn weke du bira, ta ko bûne

hevlingên hev. Yanî bi kurtî me jiyanê hevbeş bi hev re domand ta roja 26.03.2020an roja ko Xwedê lê xweş be Keyo serê xwe danî û raza, razana bê hişyarî. Ew çû ber dilovaniya xwedê û em weke malbata Mela Ehmedê Namî di nava xem û derdan de hiştin.

9. Çi bîranên we hene hun dixwazin ji xwendevanên NEWROZê re bibêjî?

Di salên 40de, gelek civîn bi beşdarbûna siyaştvanên kurd dihatin lidarxiştin. Yek ji wan civînan, civîna sala 1948an li bajarokê Tirbespiyê bû. Rojek ji rojên buhara têrgul, oda mala Haco Axa bi mêhvanên qedirgiran û ji gundiyan dagirtî bû. Qehweçiyê odê Ehmedê Mircan (mirovekî ji welatê Sûdana Afrîqa bû) bi şadîmanî qehwa tal li mêhvanan û kesên rûniştî digeland.

Vê carê jî weke carên berê, ez ligel bavê xwe bûm. Lê ew çûn ji bo çî bû? ew ji min re ne xuya bû. Tenê ji min re diyar bû ko ev çûn weke gelek caran ziyareta mala Haco Axa ye.

Mêhvanên wê rojê weke ko hîna tene bîra min û yên ko bavê min ew bi bîra min anîn: Celadet Alî Bedir Xan, Doktor Ehmed Nafiz, Qedrî Beg Cemîl Paşa, Ekrem Beg Cemîl Paşa, Cegerxwîn, Arif Ebas, Hemza Muksî, Evdîlkerîmê Mela Sadiq, **8**

Hevpeyvîn ... Dûmahîk

Evdilrehmanê Eliyê Yûnis, Mihemed Elî Şexmûs (Şiwêş), Evdê Têlo, Mela Ehmed Namî û kurê wî Samî, digel mazûlvanan, malbata Haco Axa.

Ez li navbera bavê xwe û Mîr Celadet de rûniştî bûm. Mîr bi min kêfxweş dibû û pirsaxwendin û tendurûstiya min dikir. Lê pirsaxwî ya herî girîng ev bû: Samî tu bi kurdî, bi elfabêya latînî dixwînî?. Bersiva min jê re ev bû: Belê mamo.

Bavê min ji Mîr re got: Ezbenî ne tenê bi kurdiya latînî dixwînî, lê hin helbestên kurdî yê min jî ezber kirine digel helbesta Qedrîcan ya bi navê: Serdarê Kurdan Berzanî. Eger tu emir bikî ew ê di vê civatê de bixwîne.

Mîr digel xelkê civatê doza xwendina helbestê li min kirin.

Bi lez maseke biçûk li nava odê hate danîn, ez hilkişiyam ser masê û min dest bi xwendina helbestê kir:

Berzanî, Berzanî,
kî vî navî nizanî?

Di cenga welat de, di meydana xebat de
Pehlewan, qehreman
Tiwî, biwî Hîmê
K u r d i s t a n ...

Wilo min xwendina helbestê bi dawî anî. Xelkê civatê bi tevayî ji min re li çepka xistin. Mîr li piyan rawestîya û ber bi min ve hat û ez himbêz û maçî kirim û li teniştaxwî

rûniştim. Piştî ko Hesênê Haco Axa jî ez maçî kirim.

-Di sala 1949an de Namî, li bajarê Şamê bû. Di serdana Mîr Celadet Bedir Xan de, li hêwana mala wî ya ko weke mozexaneyekê rûniştî bû. Piştî silavan û bi xêr hatinê. Mîr pirsaxrewşa kurdan li Cizîrê dikir û di nava guftûgoyan de Namî ji Mîr re got:

Ezbenî ez dixwazim serikê qelûneke kevnar e ji te re diyarî bikim, da ko di vê mozexanê de cî bigre, mixabin diyarî li mala me li gundê Tilşêrê ye. Hêvîdar im tu vê diyariyê ji min bipejirîn û çî dema weke hemû caran ko diçî Tirbespiyê, ji kerema xwe re li gundê Tilşrîrê raweste, hingî kurê min Samî wê diyariyê pêşkêşî te beke, min Samî û dayika wî bi wê yekê agahdar kirine.

Rojekê ez li malê bûm, mirovekî gundî hate mala me û ji dayika min re got: Jinseyda... wa ye Mîr Celadet Bedir Xan li gel Hesênê Haco li ribata pêşiya gund in û doza diyariyekê dike.

Dayika min bi lez ew qelûn da destê min û got: Kurê min here vê diyariyê digel silavan bighîne apê xwe Mîr Celadet Beg.

Bi şadîmanî min qelûn hilgirt û çûm.

Mîr Celadet digel hejmarek mezin ji gundiyan li wir bûn. Min bi rêz silav digel bixêrhatinê pêşkêş kir û qelûn da destê Mîr.

Mîr riwê min maçî kir û

min jî destê wî maçî kir.

Mîr ji min re got: Gelek spas biraziyê delal, tu her xweş bî. Silavên bavê te ji te û dayika te re hene. Paşî otomobîl ber bi Tirbespiyê ve bi rê ket.

Di sala 1959an de, hîna em li bajarê Şamê xwendevan bûn. Ez digel hevalên xwendinê, Sebriyê Hesênê Melê, Smayîlê Dihamê Mîro û Elaedîn Mihemed çûne mala Mîr Celadet Bedir Xan ji bo serdana Rewşen Xanim Bedir Xan li taxa Mihacirîn. Li hêwana malê, ewa ko Xwedê lê xweş be Mîr, kiribû weke mozexaneke biçûk, min ew qelûn, diyariya bavê xwe digel hejmarek ji entîkeyan bi dîwarên wê muzexanê ve daleqandî dît.

Xwedê lê xweş be Rewşen Xanim ji min re got: Samî kurê min, eger li bîra te be. Ev qelûn diyariya bavê te Namî ye ji rehmetyê Mîr re bû, ta ko ez li jiyane sax bim, wê diyariya Namî bi paşmayên Mîr ve di vê muzexanê de bimîne.

10. Ji bo zimanê Kurdî, fêrbûna û hîna wî, guhdan li dîrok û folokloraKurdî, hun çî ji keç û lawên gelê xe re dibêjin?.

Ronakbîr Dr.Nûredîn Zaza di pêşgotina pirtûka Memê Alan de dibêje:

Gelê kurdan...

Eger hun naxwazin ji hev taromar û winda bibin, berî her tiştî, zimanê xwe

bixwînin û bidin xwendin.

Lê eger dixwazin xwe nas bikin û xwe bidin nas kirin û hez kirin û bi hevaltî û dostaniya milletên din re pêşve herin û bi rûmet û serbilind bijîn, dîsa zimanê xwe bixwînin û bidin xwendin.

Helbestvan Mela Ehmedê Namî dibêje: Dîbîstanan bi lez çêkin, hebixanan bikin wêran Nemaza xwendinê pir kin, ji bo me her ev in derman

Yek ji erkên hebûn û zidîbûna milletan ziman e. Dagîkerên Kurdiştanê bi hemû hêzên xwe ve zimanî kurdî qedexe dikirin, lî dîsa jî milletê kurd zimanê xwe ji windabûnê paraşt, ew jî bi hebûna hicrikên feqehan û bi çalakî û guhdana rewşenbîrên kurd yê vî dema dawî ku Ziman paraştin û pêşve birin. Vêce ji keç û xortên Kurd tê xwestin ko xwe hînî xwendin û nivîsandina hemû rengên zanîn û zanyariya kurdî bikin, da ko di pêşerojê de, zimanê kurdî ciyê xwe yê taybet di nav zimanên cihanê yê giranbua de bigre.

Daxwaza serkeftinê ji we û Weşana Newroz re dikim û gelek spas.

Li dawiyê NEWRO spasîyên xwe pêşkêşî we dike ku we ev dem ji bo wê terxandîye, hêviya temenkî dirêj, bê derd û xem ji we re dike.

Gelek spas.

Rexneyên Idwarid Seid li Rojnamegerîya Amrîkî

Dr. Azad Ehmed Elî

Zana û akadimisyane felestinî – Amrîkî perfesor Idwarid Seid rexneyên zaniştî û bê alî li karêmedyaûrojnemavaniya Amrîkî dikir, ew bi taybet di pertûka (Covering Islam) de tê dîtin. Ev pertûk jî li ser bûyerên sala 1979 yê go di navbera Iran û Amrîka de qewimîn hatiye nivîsandin.

Yekem rexneya li rojnamevaniya Amerîkî dike, ewe ku, îslam wek nûçeyek midyayê tê şopandin. Têde, Seid dibêje kû Amerîka îslam baş nas nedikir, ji ber vê yekê medya Amrîkî rabû wênek li gor dilê xwe ji Îrana, Farisî û Şîeyan re çêkir, piştê wênek ji îslamê re bi rengekî giştî ava kir.

Di vî warî de, bi ferehî Seid li derbareya serxebûn û bê alîbûna medya Amrîkî

radiweste, wê serbixweyîyê ne raşt û derewîn dibîne. Lê belê ew serxwebûn bi rengekî rîletiv e, medya karekî bi armanc û erk dike. Çend pesporên Medya Amrîkî destnîşan dike ka çi li ser bêalîbûna Medyayê dibêjin: Wek çêkirina nûçeyan û dem û rengê belavkirina wan.

Û çend xalên girîng destnîşandike:

Medya Amrîkî bi xwe wek perde û serûka dezgehên desalt û yên abûrî yên mezin dide xuyakirin. Ji ber Seid tekez dike kû çapemenî û ragehandin bê alî nîn e, ew derewek kultûra rojava ya mezin e.


Raste nûçe bi xwe bêalî ye, lê nûçeçêkirin li Amerîka zaniest e, herweha reng, babet û demê belavkirina nûçeyan armanc û erkên wan hen e. ji bo avakirina

raya giştî, Mediya Rojava bi giştî armanc û sistemeke xwe heye.

Hin têbîniyên din Seid dide xuyakirin: Rojname «Newyork Time» rûdawa dagîkirina balyozxana Amrîkî li Tehranê sala 1979an kire çîrokek mezin, kir çîroka Îranê û çîroka îslamê jî di pey re. Di vî warî de dinivîse: (N.T.) karî bi zanebûn wê bûyerê bike dozeke netewî ya Amrîka, û rîsên dijminayetiye li dijî îslamê bihûne, Islama Şîeyî û peyre Îrana Farisî dike armanc.

Dîse rahijina (N.T) dide ber karê rojname «Lomund» ya Firensî pê rabûyî, bi zelalî Medya Firensî, bi taybetî (lomund) baştir ji ya Amrîkî wek (N.T + C. B.S) dît û nerxand.

Li dwaiyê dide xuyakirin kû Medya welatên Rojava



ewe fakterê yekê di çêkirin û damezrandin û geşkirina doz û çîrokên mezin de, wek doza naskirina Islamê, dîse diyar dike ku tenê Medya karîbû wêneke dijwar û reş ji îslamê re ava bike.

Piştî hêza leşkerî ya Amrîka şikest, û nikarî girtiyên Amrîkî ji Tehran sala 1980 rizgar bike, ji wî çaxê pêde, Medya wek hêza yekem li Amerîka hate naskirin. Lê I.Seid dîse tekez kir ku Medya her û her hêzek sînûrkirî li Amrîka, û belkî li her derî dimîne.

Mafê çarenûsî yê Gelê Kurd, mafekî rewya ye, lê.....

Bavê Leheng

Weke hûn dizanin, Gelê Kurd û Kurdiştanê di dîrokê de, du caran tûşî perçekirin û jiheşelandinê bûye. Cara yekê, li sala 1514an, di encama Şerê Çaldîranê de, di navbera Imperetoriya Sefewî û Imperetoriya Osmaniyan de, hate parvekirin, û cara dudiye jî, li sala 1916an, di encama şerê cîhanê yê yekê de, bû çar beş.

Beşê ku, berê di bin destê Sefewiyan de, weke

xwe ma. Û beşê din ê di bin destê Osmaniyan de, bû sê perçe, percê herî mezin jê di bin destê Turkiya Ateturk de ma, yê dudiye bi ser Dewleta Îraqê ve hate kirin, û yê sisyê - yê biçûktir - jî bi ser Dewleta Sûriyê ve bû. Ji dabeşkirina yekê ve, Gelê Kurd tu carî serî netewandî, û hertim û bi şeweyên tîkel, ji ber doza azadî û serbestiyê de, berevanî û fedekarî kiriye û buha û qurbanîyên bê hempa daye.

Ew xebata dûr û dirêj tev

ji ber ku, dewletên zeftkar ji Kurdiştanê re, ne tenê welat di nav xwe de parve kirine û hew; Ew zor û zordarî, bînpêkirin, çewsandin, girtin û binçavkirin, îşkencekirin û kuştin, û komkujiyan jî bi awakî berdewam, li dijî Kurdan pêk tînin. Bi ser de jî bi hev re pilan û pêlanên xwe jî ji bo tunekirina me, bi hev re hevrêz dikin. Zatiyê kiryarên hovane yên ku, niha û bi hevrêzî li dijî me dimeşînin, berdewamiya nijadperestî û ne mirovahiya

wan e. Lê, berdewamkirina hovîtiya wan dîsa nikanî gelê me çavtirsîya bikira û tevgera xebat û rizgariyê li her çar beşan rawestandana û ne jî kanî rawestanda. Ji ber ku, Gelê me yê Kurd, xwedî xak, çand, dîrokek dirêj, ziman û hejmareke mezin e. Vêca, çendî yên newêrek, bêdeng û xwefiroş hebin; Ewqas jî yên bi rûmet, qehreman û fedelar jî pir bin. Lê mixabin, xebat û qehremaniya, ku dibû û niha jî dibe, - ji bilî nimûna Herêma 10

Newroz, li te pîroz be salvegera zîvîn

Derwêş Xalib



25 sal Newrozê serkeftî buhartin, li ser rêçika bikaranîn û pêşvebirina zimanê kurdî bi giştî, û bi taybetî mijara zarawe û têgehên siyasî, ku biwarekî zimanewanî girîng û pêwîst e. Zimanê kurdî naveroka kurdîtiyê ye. Ji hêlekê ve nasnameya gelê kurd e, hem kewara zanîn û hişmendiya kurdî ye, hem jî rûçik û şeweyê têgehiştina gelê kurd e. Ji hêleke din ve, ziman meydana şerê gelê kurd bi sitemkaran re ye. Xêrnexwaz astengên di riya zimanê kurdî de peyda

bûne (ku wan bi xwe durîst û afirandine) dikin behane û di şerê sipî (sîkolocik- şerê taybet) de bikar tînin. Û jibo ku ew ziyarên ku gihandine ziman û gelê kurd hîn kûrtir û firehtir bikin, û gurzeke xurt bavêjin bingehên tevger û xebata kurdewariyê, Sitemkar dixwazin bêjin: (kurd ne miletek bi serê xwe ne, zimanê wan nîne, miletekî neresen e, rikberiyek bêhude û bê encam dikin û daxwazên wan nerewan in).

Sitemkar dixwazin heştê kêmasî û biçûkiyê li nik takê kurd bafirîne, ji bo dudilî û newêrî daweve dil û hinavê keasayetiya kurd, û nikaribe helwestek erinî bigire, nikaribe li ber xwe bide, ta ku bikaribe, hesan tevgera kurd beravêtî bike û biperçiqîne. Raweştan û xweragirî himber

vî şerê taybet bi hemû core û şewazên xwe ve erekekî serekî têkoşîna rizgarîya gelê kurd ji vê bindestiya ko îro tê de ye, dikeve ser şanê her kurdekî dixwaze ji vê zulmê rizgar bibe.

Berî herkesî, ew stubariya hêz û partiyên kurdî ye. Mixabin, partiyên kurdî li Sûrî bi erekên xwe ranabin, berûvajî, cihekî şayiştê di belavok û ragihandina xwe de nadin ziman û çanda kurdî, pîranîya pir ji wan, yekcar bi kurdî nanivîsin. Ev (têkoşer) ku şiyarên xwe ji pere, hêz û endamên kurd distîne, lê ava kaniya wan aşê kurdewariyê nagerîne!

Li meydana xebatê, hêza sereke dimîne gel, bi taybetî ciwan û bîrewer dikarin pir tiştan bikin, û di dîroka miletan de nimûneyên wise

hene ku kedkarên ziman rêçika fireh ji bo pêşketina siyasî, rewşenbîrî û civakî vekirine. Belkî em tev dizanin bê mîr Celadet, Cegerxwîn û hevalên xwe bi çiqas bandor bûn. Mînakek din ji Oropa. Têkoşîna gelê Flaman li Belçîka, berî sed salî zimanê Flamanî li Belçîka ne zimanekî fermî bû. Dûvre diyar bû ku filaman zêde ji 50% ji Belçîka pêktînin. Ciwamêran tevgerêk ji bo zimanê xwe meşandin û gav bi gav qezencên siyasî jî wergirtin, di encam de gel û zimanê wan hate nasîn. Tenê sala 1969 aştê danpêdana Flamanî gihişt aştê Fransî. Îro Belçîka dewletek konfederal e û mafên Flamanan wek yê fransiyên e. Bi raştî jî, gelê kurd xebateke pir mezin û dijwar di ber zimanê kurdî de kiriye. Tevî hemû 11

Mafê Çare ... Dûmahîk

Kurdiştanê ya niha- cîbcî û tekane ye, yanê vê lêvger e. Wêlomê jî, em Kurd bê pirojeyên giştî ne, di devê dagîrkeran de dibin pariyek hêsan, ji hev tene dizîn, û tu serkeftinên berbiçav bi dest naxînin. Li gor rewayên asîmanî, zagon û hevpeymanên navdewletî, û biryarên Neteweyên Yekgirtî û Encûmena asayî ya navdewletî yê girêdayî mafên mirov û miletan; Ji mafê Gelê Kurd e, ku biryara çarenûsa xwe bi xwe bistîne. Mafê çarenûsî jî, ji bêmafexwaziyê de dest pêdike û ta dewletbûnê. Yanê, daxwaza dewleteke serbixwe jî rewa ye. Lê,

dabeşbûna Kurdiştanê di nav Turkiyê, Îran, Îraq û Sûriyê de, taybetmendiya rewşa hundirî ya her beşekî, têkeliyên asayî û aborî di nav her çar dewletan de, û berjewendiyên navdewletî yê mîna kevzê di nav hev de, Pirsê kurdî bi tevayî û ya her beşekî aloz, nazik, û barê tevgera kurdî girantir kir. Yanê rewşa heyî hîşt ku, em Kurd piroje û mafexwaziyên xwe li gor taybetiya her beşekî bipîvin, û têkeliyên xwe yê biratî û Kurdiştanî biparêzin. Yanê, xebata me gerek li ser sê aştan be, aştê kurdî ya her beşekî, aştê her welatekî ji van welatên ku, Kurd di nav

wan de hatine dabeşkirin, û aştê kurdiştanî bi tevayî. Ji ber vê rewşa zor heştîyar û pîrbûna partiyên me yê kurdî li her beşekî, pirojeyên taybet ên her partiyekê, emê bi çî rengî kanibin ji dost û dijminan re piroje û daxwazên xwe yê her beşekî, bi awakî pîvayî û bêyî, ku nakolîyên navxweyî derkevin, pêşkêş bikin. Pirs ew e, ji mafê kê ye, kane nûnertiya Gelê Kurd û çarenûsa wan li her beşekî û li seranserî Kurdiştanê bike? Ger raşt em xwe berpirsiyar dibînin, bersiv hêsan e, û tenê du lêveger gerke me ne, yek li ser aştê her beşekî, û ya dudiyê

li ser aştê her çar beşan. Pirsê din jî, damezrandina van lêvegeran stubariya kê ye? Bi nêrîna me, serdefter stubariya Herêma Kurdiştanê û Rêvebirîya xweser e, pileya dudiyê jî - kê mîna zêde- stubariya alî û partiyên dine, û pileya sisiyê jî ya hemî kesayetiyan serbixwe û çalakvanan ne. Ger raşt em xwe berpirsiyar dibînin û dixwazin berepêş gavan bavêjin û destkeftiyên bi dest bixin...Bila silogana me tevan ev be. «Kar û xebat û bê raweştan ji bo avakirina lêvegera siyasî be».

Bila NEWROZ Her geş û zindî be!

Dr.Memo Ebdê

Bi boneya têperbûna 25 salan li ser weşana rojnameya NEWROZ a bi zimanê Kurdî, pêwîste ev qonax bi şeweyekî babetane bê nixandin, da ku bibînin ta kîjan astê zimanê meji gelek pirs û mijarên heştîyar û girêkoyî re, tevî hemî kêm û kasiyên di gewde û rêzimana wî de cih girtine, bûye bersiv.

Ma gelo zimanê me dikare hemû pêşketinên rêzimanî, ferhengsaî û zanişiyê hambêz bike û pergaleke guncaw û lihevhatî derbibrîne?! Gelo piştî HAWAR a Mîr Celadet, em dikarin behsa

berdewamiya zindîkirina ziman û wêjeya Kurdî bikin?. Yan ji şerm û fihêtiyê em ê serî biçimînin û pîsepîs xwe veşêrin?!

Helbet, prosêsa geşepêdana zimanê Kurdî ya bi tîpên Kurdî ya Latîni ku Mîr Celadet û Kamîran û hevkarên xwe destpê kirine û bingehên rast û durust û zanişî jê re danîne, lê tevî ku ew di heyamine aloz û metirsîdar re derbas bûye jî, ev xwedîderketin bidawî nehatiye û hêj berdewam e.

Jixwe her tim law û keçên Kurd ên heyran û dilsoz, ala Bedirxaniyan li erdê nehiştine, û çî hatiye xwestin, bêbedel pêşkêş kirine û hê jî dikin, çimkî

ew bawer in ku Zimanê me, hebûna me ye, jê zêdetir, ew rûmet û niştîmanê me ye!. Ji lewre, dijminên Kurdan dixwestin Kurdan bikujin û rihê Kurdewariyê bimînin, jê rakin. Bi hewldanên qedexekirina Zimanê Kurdî û tawanbarkirina çî kesê têkildar pê re bi tawanên herî giran, teqez ku pêngava 15ê Gulanê ku hejmarê «1»ê ji kovara HAWAR ê bi serperîştîya Mîr Celadet Alî Bedirxan derketiye, şoreşeke hişmendî û serhildana zimanê Kurdî bûye. Pênûsa ku HAWAR pê hatiye nivîsandin, ew mîna tivinga ku Pêşmerge û Gerîlayên me hilgirtine û li her çar parçeyên Kurdistanê



gelê me diparêzin.

Hezkirina ji ziman û têkoşîna di ber de, cihê rûmet û rêzgirtinê ye. Şehîdê zimanê Kurdî Mûsa Anter tim digot: Bêziman, Tirko wê me biqelîne!.

Bila NEWROZ her geş û zindî be, bibe neviya HAWAR a Bedirxaniyan û dengê WELAT a apê Mûsa be!.

Yobîla Zîvîn a NEWROZê li gelê Kurd û Kurdistanê pîroz be, bila Bavê Şiyar û Diljar Seyda di gorên xwe de şad û bextewer bin.

Gotinek di 25 saliya weşana Rojnameya Newroz de

Konê Reş



Rojnameya Newroz; Ji weşanên Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurdî li Sûriyê- Yekîti (Elwihde) ye, Rojnameyeke xurû bi Kurdiya latîni ye. Siyasî û civakî ye. Hejmarê pêşî (1), di Gulana 1995an de derketiye û hêjî berdewame di derketina xwe de.. Di baweriya min de yekemîn

rojnameya kurdî ya siyasî ye di nav kurdên Sûriyê de.

Li ser berga hejmarên wê wêneyê du siyasetmedar û nivîskarên kurd Osman Sebrî û Dr. Nûredîn Zaza xuya dikin.. Di baweriya min de ev yek nîşana reseniya rêvebirên wê ye.. Û armancên rojnameyê wiha hatine nivîsandin: Xebat ji bo; Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe. Azadiya demokrat û rêzgirtina mafê mirovan. Mafên gelê Kurd yê netewî di çarçewa yekîtiya welêt de. Jixwe wek van armancan hêviya kurdên Sûriyê ye.. Daxwazek rewa û di cihê xwe de ye.. Zor

xweş e, ji xwe daxwaza me eve ye..

Ji 25 salan ve, ez vê rojnameyê dişopînim û dixwînim.. Vê rojnameyê zimanekî siyasî di nav kurdên Rojav de çandiye.. Berê ew kovar û rojnameyên ku hebûn, tev edebî û rewşenbîrî bûn.. Lê bi babetên ku di rojnameya Newroz de belav dibin, em derbasî zimanê siyasî jî bûn.. bêguman gavek giring e.. Xwezî ev rojname bêtir gelêrî ba.. Dergehê wê ji nivîskarên gênc re jî vekirîba.. Hem jî, xwezî guhdana wê bi bûyerên civakê re, ji wilo bêtir, heba.. Ji xwe madem bi

kurdî ye, rola wê di hezkirin û belvîkirina zimanê Kurdî de zor mezin e..

Ez westandina rêveberên wê bi giranî dinirixînim, keda wan di ber çavên xwe re derbas dikim û ji dil û can wan pîroz dikim û hêviya berdewamiyê ji wan dikim.

Newroz ... Dûmahîk

zor û astengiyan, îro zimanê Kurdî ji Farişî û Tirkî paktir û paqijtir e, naşibe zimanekî bindest.

Newroz yek ji wan navgînên fêrbûn, belvîkirin û pêşvebirina kurdî ye. Bera her domdar be. Bera destên nivîser û sernivîserên wê sax bin. Ew çavên me ne.

Pîrozbahî

Dr. Azad Ehmed Elî
Sernivîserê kovara
AlHiwar



Heval û hogirên hêja di Desteya rojnama Newroz de Salvegera (25) an ya derçûna rojnama Newroz

bi germî li we pîroz dikim, ked û bizava we ya demdirêj û berdewam cihê pesnê û serbilindiyê

ye. Cefa û jana we bi salan kişandî bi başî dinerixînim, ji ber çapkirin û belavkirina rojnameke siyasî bi zimanê kurdî, karekî ne hesanî bû, ne hesanî bû ku hûn pêvajo û rêçika rojnamegerîya kurdîya resen bi vî rengî berdewam bikin.

Gelî hevalan: karê we

kirî, her û her pîroz e, hêvîya berdewamî û serkevîtinê ji Newroz dikim. Bila hûn her hebin li ser rêya azadî yê, li ser rêya berxwedan û rizgarîya deverên ji welatê me hatîn dagîr kirî, Newroz û Çiyayê Kurdan dê her geş û bilind û kurd bimînin.

Bîrwerîn... Silav li te Efrîna min

Melek Şêx Murad

Bi dengê bilnd , bi êş keser,û kerbeke giran min deng lê dikir û weha jê re digot: Silav li te Efrîna min,dayîka min!. Çiqas heyf û mixabin ku va ye bêtirî du salan e, tu di bin nîrê dagîrker û setemkarên bêbexit de li ber xwe didî. Dizanim êş û birînên te, roj ji rojê bêtir hewiş û gol vedidin!. Ew hawar û qêrîna te, herdem di guhên min de mîna zengilên mirêh û beranan bi hêz xwe lêdidin û lêdixin, di jiyana xem û êşan de gêjo -mêjo û winda dibim!. Di derya biranînan de, li hêviyan digirim. Tucarî tu nayê jibirkirin delala min!. Ew şer û êrişên lawir û hovên çol û baniyan, ku wan bi kînen mezin her tişt didane ber xwe, kaviil û wêran dikirin.

Wisana jî canê te yê nazik û delal, wan bi hovîti didane ber darê êşkencê û bi hezaran birînên curebecur li canê te yê pîroz vedikirin!. Lewre jî, qîr û hawara te çem û çiya dihejandin, zinar û lat diteqandin!. Hîngê dadmendî tarûmar dibû, Goga zemînê jî çeb dizîvirî, ezmanan reş girêdidan û tofaneke har û

dîn radigehandin!. Buhar, sala 2018 an bi xemgîn ji şahiyên xwe vedikişî û di bin basikên zulm û setemkariyê de winda dibû!. Hemû çem û deryayên cîhanê dimçiqîn!. Belê -belê û erê û erê Efrîna min, tevan ji bo te reş girê didan, û ew kiryarên dagîrkeran bi awakî protesto dikirin!.

Çiyayên Lêlûn û Hawar,Gola Meydankê, Rêjava Çemrûkê, kaniya Şiyê, darên çinar û maziye yên ku temenên wan ji dîroka dagîrker û dûvçilên wan dirêjtir û bêtir bûn, wan jî nerazîbûna xwe ji vê yekê re diyar dikirin! Belê -belê xanima min, çi û çiqas pir mixabin, tenê ew dewletên mezin û xwedî hêz li pêş serpehatî û neheqiya terûrîstan bédeng, ker û lal diman, çavên xwe li ser raştîyê dadimrandin û mafên mirovan bînpê dikirin, ji bo berjewendiyên xwe, hemiyane neheqiya xwînmijekî mîna Erdoxan û koleyên wî, şerim û fedî dipejirandin!. Lê bawer bike Efrîna min, tu yê her û her bajarê Aştî û zeytûnan di dilên Efrînyan de bimînî, bi tu hawî, tebat û hêmenî bi canê me û te nakeve, ta ku rojek bêguman yê were, û emê li hebêza te



vegerin, wa hîngê li te û me dê tebat û hêminî vegere.

Hêjî ez di wa destnav û xure-cirê de bûm, dengê ji kûraniyê ve, hejar û melûl di guhên min re derbas dibû û weha digot : Erê -erê keça min, ez her tiştî baş dizanim!. Lewre jî, temî û şîreta min li we be, wa gotina bav û kalan, bi tu carî jibîra nekin : (ker ket, ji xwediyane mekintir nîne) va gotinê mîna guharan bi guhên xwe vekin û bila di hiş û bala we de bimîne. Hevdu bi yek dest, bi yek hêz û bi yek rêz bigrin!. Hîngê, tu hêz ti qiwat nikarin li pêş vîn û armancên we bisekinin, û bê erê û na, hemû dewletên navnetewî digel Emerîkan û Rûsan jî, yên rêza we bigirin û hûnê bi balkêşî di kaştîna Cîhanê de çiyekî bêlikirî bigrin. Bi serê min û te be, keça min!, ez li pêş ew kesên ku xwe mîna lehengan dibînin, û ew bi navê

min ji dêvla neyaran, bêşerm şerê birayên xwe dikin, bêhêvîti û dudiliyê li hawîrdor belav dikin, û dilên dijimin şa dikin, wahîngê ew hemû derd, êşên têvel li nava sêsed û şêsit û şeş (366) gundên me belavdikin.Çi û çiqas heyfe, ku ew bi vê yekê li ba dijiminên me bi kurdên baş tene naskirin!. Bila ew kesina baş zanibin ku tu carî ne ez û ne jî, çiya, zevî, çem, gelî -newal şikeft û berqefên min, wan weke dost nasinakin û napejirînin. Ew hêz û hêviyan diçelmisîni!. Ew kesina pîlanên dijimin û neyaran pêktînin û yekîtiya kurdan bi paş dixînin. Xwelî li serê wan kesan be, bila ew baş zanibin ku bi vî awayî, ew navên xwe di dîroka rûreş û keysebazan de diçesipînin !.

... Hîno -hîno ew deng winda û qut dibû, ez jî bi dengê keça xwe re ji xewê şiyar dibûm!.

Li Başûrê Cîhan Dengê kalekî Kurd!

Riza Çolpanê Dêrsimî



Xuşk û birayê minên xoşewîst, xwendevanên vê rojname ya ku nav Newroz e. Ez di hivdeh (17) salîna xwe, angû 14 Avrêl, 1951'î da li ser erdê heftsed bav û kalên xwe dîrketim bûm terkî welat, lê laşê min li xurbetê, balam gîyana min her dem li welêt, angû Kurdistanê, li gundê min e; lê sed mixabin ku raştîya ber bi çav, di vê dema kaltîya xwe da, ez ji warê bav û kalanên xwe 18.000 kîlometre dûr, (50 sal) li ser erdê Cemsera Başûrê cîhan, Kîşwera nav Awîstûralya, li bajarê nav Sydney da dijîm. Angû ev e 68 sal in ku ez ji welatê bav û kalên xwe dîrketim, di kûrahîya dil da jî kesera welêt, qom û qebîl, gelê xwe yê mazlûm û bindest, Kurdistanek Azad, Demokratîk û Serbixwe dikşînim; ku mirim jî, divê laşê min were şewitandin, xwelîya laşê min here Kurdistanê bav û kalan, herêma Dêrsima xopan, gundê min Kûpik. Gelo kê ez kirim terkî welat, sedem çi bû???

Xwendevanên berrêz, ez li çar Kîşwerên cîhan gerîyam, min gelek erd û welat, erdnîgarîyên cîhan

dîtin, lê min ji bilî gundê xwe Kûpik, bajarê xwe Dêrsim, cîyekî dî ne dîtibû. Piştî gelek salên dûr û dirêj, min biryar stand ku herim welatê heftsed bav û kalên xwe, tevahîya Kurdistanê çeleng, xweşik û wekî bihişt bibînim û min wer jî kir. Di destpêkê da hatim wî parçeyê ku bi hezaran sal berê, bav û kalên we yên qedîm, îro jî hûn li ser dijîn, ji du dijminên har, hov û barbar ra şer dikin, li tev şerê nexweşîya lata corona, Kurdistanê Rojava.

Xuşk û birayên delal, berê ez li Helebê peya bûm, bûm mêvanê terzî Osman, ku ew camêra îro li Danîmarkê dijî, dûra jî di roja 72001-5-î da li Qamîşlokê bûm mêvanê Kek Îsmail Omerê dilovan û gor bihişt, hevalê wî yê hêja Kek Newaf Abdullah. Piştî mêvandarîya heftekî ez çûm Başûrê welêt, parçeyê azad, li wir jî dîsa dagerîyam Qamîşlokê, mala Kek Newaf, piştî çend rojan, vêca jî min berê xwe da Bakûr û gundê xwe; li wir jî çum parçeyê Rojhilat, li çend cîh û bajaran gerîyam, bûm mêvanê Kurd-birayên xwe û nasê erdnîgarîya çar parçan. Angû wan rojên gerra çar parçan di jîyana mina heya roja îro da, cîyekî taybetî standin, ez bûm nasê gelek Kurd-birayên xwe û erdnîgarîya welatê bav û kalên xwe, kêfxweş û serbilind bûm; lê sed mixabin ku hêj ew

erdnîgarîya bav û kalan, wekî bihişt, di bin lingê sê nijadên har û hovan da dinale, Kurd-birayên me jî bi tevahî ji hev ra nebûne bira, nebûne dost, hêzên xwe li hember dijminan nekirine yek, dost û dijmin ji hev cihê nekirine, ku ev rewş jî dilê hemû Kurdperwerên Kurdistanê diêşîne. Hêvî dikim êdî hemû Serok û rêberên gelê Kurd, dost kî ye, dijmin kî ye, ji hev cihê, hemû hêzên xwe jî li hember dijminan dikin yek. Bi vê hêvîyê, ez ji dil 25 salî ya vê weşana Kurd û Kurdistanê, ku navê vê Newroz e, ji dil pîroz dikim, hêvî dikim rûpelên vê weşana Kurdî ji hemû Kurd-biran ra bibe weşana kevoka aşî, balyoza biratî, heşt û hişê demokrasî û jîyanek wekhevî, şewqa rêya dost kî ye, dijmin kî ye. Bi vê hêvîya dilê keserkêş, ji hemû nivîskar, xwendevan û radeksîyona Newrozê ra silavên biratî û Kurdperwerî rêdikim, ji rûpelên Newrozê ra jî du helbestên xwe dişînim. Hêvî dikim bên weşandin.

Dayîka Min

Gundê min, warê min
Ez di axa te da derketim
Welatê min
Bi wê axê hat surandin
Hêvîyê min
Goştê laşê min axa te
Hestîyên min kevirên te
Xwîna min av, kanî û çemên te
Gîyana min hewayê te
Por û pirçên laşê min

Dar, dariştan û kulîlkên te
Tu yî jîyana min
Tu yî gîyana min
Nan û av û xwê ya min
Hiş, pejn û pênc heştên min
Tu yî dayîka heftsed bav û kalên min
Ez ji te ra bibim cangorî
Bedewa cîhana min
Dayîka min
Kurdîstana min.

Min Nedît Welatek Wek Welatê Xwe

Gerîyam cîhan, ez welat, welat
Min nedît welatek wek welatê xwe
Amed, Cizra Botan, tev birc û kelat
Min nedît welatek wek welatê xwe

Dêrsim, Riha, Mêrdîn,
Mahabad, Hewlêr
Warê mîr-mêrxwasan,
lana piling, şêr
Li her derê sifir, nift û zîv û zêr
Min nedît welatek wek welatê xwe

Çem kanîyên avsar, deşt, çîya, zozan
Dîmena gund goman,
gelîya Barzan
Bin holikên çilo, raketin, razan
Min nedît welatek wek welatê xwe

Pirr xweş û şîrîn e, çar demên salê
Zivîstana sîs-berf, ser piştê malê
Nêçîrvanên 14

Jiyana rojnama Kurdistan

Mislim Şêx Hesên



Werza biharê, 22 Nîsanê 1898 an zayînî Mîrê kurd Mîqdad Midhet Bedirxan yekemîn rojnama ya bi navê Kurdistan li paytexta Misirê El Qahîra li çapxana El Hîlal çap kir. Weşandina rojnama Kurdistan di wê demê de gaveke zor pîroz

bû, nexasim bo şiyarbûna gelê Kurd li seranserî xaka Kurdistanê, ji ber ku di hemû warên jiyane de mijar û babet diweşandin (siyasî - civakî - olî - aborî... HWD). Rojnama Kurdistan, bi tîpên Erebi û zarava Kurmancî mijarên xwe nîv mehan e di hindirê çar rûpelan de diweşand, û carê nekêmtirî du hezarî 2000 î dihat belavkirin li Kurdistan û Ewropa. Hejmarên rojnama Kurdistan Sih û yek (31) jimar hatin weşandin, jimara (1...ta... 5) li paytexta Misrê El Qahîra hatin çapkirin, û jimara (6...

ta...19) li welatê Swêsrayê, bajarê Cinêvê li ser destê birayê wî Ebdirehman Bedirxan hatin weşandin, her wiha cardî jimara (20... ta...23) li Qahîreyê li ser destê Sureya Bedirxan hatin çapkirin, Lê jimara (24.... ta...29) li bajarê Folkîston Birêtaniya hatin weşandin, û herdu jimarên dawiyê (3031-) dîsa li Cinêvê hatin çapkirin û bi jimara (31) kuta bû mixabin. Lê hêjayî gotinê ye ku hemû jimarên rojnama Kurdistan di pirtûkxana (HAMBORGÊ) de li Almanya paraştîne. Vêca bi bona Salvegera 122

salan hemû kesên ku ked û xebateke bê hempa bo weşan rojnama Kurdistan kirî, wê jindayî bimîne di dilê her kesî ku xemxarê kurdeyê ye, û her wiha serkeftinê ji weşanên kurdî re hêvî dikin.



Dîroka hin ... Dûmahîk

kewan li Kûpik, Dalê
Kûpik gundê ku ez li wir
ji dayîk bûme
Min nedît welatek wek
welate xwe Dal,
mezra bapîrê min e

Bîst yekê Adarê cejna
Newroz e
Li her derê agir, roja
pîroz e
Dirizin, şîn dibin, gîya,
çirpoz e
Min nedît welatek wek
welatê xwe

Dengê pepûk, kewan,
bilbil, şelûlan
Rengê mexik, beybûn,
nêrgiz û gulan
Bîhna wan jîn dide
nexweş û kalan
Min nedît welatek wek
welatê xwe

Havîna germ xweşik, gîşt

rez û boştan
Bêhrîvan xwedikin, reng
bi reng fîştan
Bihişt Kurdan e, ew erd
Kurdistan
Min nedît welatek wek
welatê xwe

Kalandina mî û berx û
karikan
Guftûgoyên pîran, li tev
canikan
Lê tama sêv, hêrmî, gîjok,
xîlokan?
Min nedît welatek wek
welatê xwe

Germika Golanê, lê yên
Baxînê?
Bin ezmanê şîn da cîyên
evînê
Evîndar li wir in, wek
Mem û Zînê
Min nedît welatek wek
welatê xwe

Çi bixwazî heye li ser

erdê wê
Bi hezaran nebat, li ser in
hevrê
Ji bîrnakim çucar, gurzên
genim, cê
Min nedît welatek wek
welatê xwe

Çîyay Sîpan, Cûdî,
Nemrût, Ararat
Çemê Minzûr, Xarçik,
Dîjle û Firat
Av kanîyên Cêwlîg,
zozanên Serhat
Min nedît welatek wek
welatê xwe

Welatê min bihişt, lê jîyan
doj e
Li ser hêwirîye Roma
mêrkuj e
Zilm û zora wê jehr, axû
û tûj e
Min nedît welatek wek
welatê xwe

Çiqas salix bidim dîsa jî

kêm e
Hişêr çavê min da wek
ava çê m e
Digîrim ez her roj, dil tijî
xem e
Min nedît welatek wek
welatê xwe

Şêşt sal zû hatin çûn ji
welêt dûr im
Dikînim keserê, ez birîn
kûr im
Temen bû heftê çar, êdî
pîr kal im
Min nedît welatek wek
welatê xwe Îro sal
bûne 85

Riza me dibêjim "Ax li
min welat"
Har hovan nehîş ku Kurd
bibin felat
Li Başûrê cihan derd
bûne qat qat
Min nedît welatek wek
welatê xwe.

/Sydney/rizacolpan@gmail.com

Hêvî... Jiyan bi xwe ye

Nazdar Hesên

Hêvî hîmê herî sereke ye, ya ku dihêle jiyana mirov xweş û geş be, di dem û rewşên tarî û dijwar de, find û mûm e, û baweriya derbasbûna rojên reş, geş û tekez dike, lewre ger mirov di jiyana xwe de bê hêvî bijî, jiyana wî tarî û bê wate ye. Hêvî jiyana bi xwe ye û jêdera geşbîniyan e, mirovê bê hêvî, termekî bê giyan e û şînatîyek bê kulîlk û ber e.

Belê rast e, jiyana ne hertim wek em dixwazin dibe yan jî wek tê xwaştin derbas dibe, helbet riya daxwaza bidestxistin û pêkanîna hêvî û armancan ne herdem, dîz û hêsan e, pir rêbend û kelem jî wê

li pêş me derkevin, carina em ê derbas bikin û carina jî em ê lê velukumin û ji wê pirtir jî dibe demên pir dijwar di ser mirov re derbas bibin derd û bela jî lê pir bibin û destkeftinên di dest de di kêlîkeke nehişyar de têkbiçin û ziyanên can û milk jî bibîne, ev jî di warên tê de ceng û pevçûn lê rûdane pirtir e.

Di vê çarçewê de, guhartina jiyana xelkên me yê Efrînê û hin herêmên li bakurî Suriyê, guhartinek ser û ber, têkçûna aramî û ewlehiyê û berdewamiya êşkişadin û zehmetkêşiya jiyana wan a heroj, û vê dawiyê belavbûna nexweşiya Korona, tabloya herî bi êş ji derd û belayên



ên li pê hev in, lê tevî wê jî, ev nayê wateya ku jiyana li pêş çavên me reş bibe, em dest ji xebat û têkoşînê berdin û tenê bibin dîlê bîranînan, poşmanî û jixwelumekirin karê me bin, û em bê hêvî bimînin, helbet jî ev daxwaza dijmin e.

Ji ber ku, jiyana me Kurdan ji ewqas sal de xebat û ceng e. Û dijminê me ne yek e û tu piştgir ji me re

nîne, hertim berevaniya me ji bo hebûn û mayîna me bû, lewre poşmanî ne derman e û bê sûd e. Ji ber wê jî tenê lixwevegerîn, ji şaşîtiyan sûdgirtin, hêvî û bawerî bi doza xwe ya dadmend û rewa ya ku helbet wê rojekê bi ser keve, û vîna vegeerê û serkeftinê bi hêztir û xurtir bike û wek tê gotin: Dawiya derd û belan jî wê were, û tu geya di bin kêvir de namîn in!...

Du sal Di ser koçkirina nivîskar Diljar Seyda re

Roja 16.04.2018an, rojek reş û bi keser bû. Di wê rojê de, ji nişka ve, li bajarokê Girkê Legê/Dêrikê, dilê xebatkar û nivîskarê Kurd Mihemed Zekî (Diljar Seyda) raweştîya, bi xemgînî û kuleke giran ev nûçe di nav nivîskar, xebatkar û hezkerên zimanê Kurdî de belav bû.

Di Desteya NEWROZê de, dilê me dixwest ku îro di şahiya 25 saliya NEWROZê de weke endamekî wê tu bi me re ba, lê sed mixabin, felekê rê neda!..

Bila cihê bihuşt be, serê malbat, dost, heval û hogirên wî sax be.

Li ser şîna wî, Nûşîn Bêcirmanê ev helbesta zêmar weşandiye, diyarî giyanê wî yê pak kiriye:

Zêrê zer e

*Diyarî giyanê nemir
Diljar Seyda re
di duyemîn salvegera
koça wî ya dawî de
Nûşîn Bêcirmanî*

*Yên bi vî sincî, kêmin
yên canfida tekane ne
ji bejna te dûr in*

*ZEKÎyê me
DILJARê gelê xwe.*

*aso û valahî
têra heştê te nakin,
ji perîşaniyê re*

*te konê xwe vedabû,
ji bêmafîyê re,
pênûsa te dilîliyand,*



*ji hevaltîyê re
te dilê fereh, vekiribû,
ji gelê xwe re
çav û mal terxan kiribûn
ji zimanê dayika xwe re,
pirtûka te tim vekirî
bû.....
ZEKÎ...
tu ji eniya xebatkaran re,
bayê hûnik bû,
ji zordariyê re,*

*bahoz û volkan bû...
ji bêhêviyê re, tim tu
devliken bû,
hêzda bû ji her kesî re,
erê ZEKÎ...
belê DILJARO.....
bavê Evîné,
Tu
Zêrê
Zer bû!!!*

CIVAKA NAVDEWLETÎ DERBARÎ KURDAN DESTDIRÊJIYÊ LI MAFÊN NAVDEWLETÎ YÊN GIŞTÎ DIKE...

Dr. Îsam E'tiya

Werger: Mehfûzê

Mele Silêman



Her wekî bêlî ye, Dewlet bi çend şeweyên ciyawaz diruşt dibin, û bi vî awayî rêz dibin:

Yekem: Cudabûn:

• Wekû dewletbûna mêtîngêh yan herêmên dagîrkirî bi hêza çekdar ji dewleta ku ew jê re paşgir û peyrew bûn.

bi vî awayî û gelek şeweyên dewlet peydabûn:

1) Dema welatên Emrîkî yên yekgirtî (USA) di sala 1776an de ji Birîtanya cuda bûn.

2) Berazîl di sala 1822an de ji Portûgal cuda bû.

3) Komarên emêrika ya başûr û navend (Meksîk, Pêro) di navbera 1810 – 1825an de ji Îspanya cuda bûn.

4) Yonaniştan di sala 1827an de ji şahinşahiya “imperetorya” Osmanî cuda bû.

5) Bengladiş di sala 1971an de ji Pakiştan cuda bû.

• Yan jî cuda bûn bi rêyeke aştîyane, wekû:

1) Nirwêj di sala 1905an de ji Siwêd cuda bû, piştî ku di hevgirtineke rasteqîne de bûn.

2) Singapura di sala 1965de ji Malîzya cuda bû.

3) Çiyayê Reş (Montînîgro) di sala 2006an de ji Yogoslavya cuda bû.

Dûwem: hilweşîn (ji hev ketin):

* Wekû dewletek mezin ji hev vebe û pir dewletên piçûk jê çê bibin, ew jî piştî şerekî:

1) mîna dewletên deryaya Beltîk (Eştunya, Lativya, Lîtwanya), ku piştî ji hev ketina qeyseriya Rûsî di sala 1977an de peyda bûn.

2) Nems, Mecer û Tişkosilovakya piştî ji hev ketina şahinşahiya Nems peyda bûn.

* Dibe ku ji hevketin aştîyane be:

1) Mîna Sovyêta hevgirtî ku çawa di sala 1991an de 15 dewletên serbixwe jê peyda bûn.

2) Tişkosilovakya di sala 1993an de her dû dewletên Tişika û Silovakya jê çê bûn.

Sêyem: karê yasayî:

• Hin dewlet bi karê yasayî diruşt bûn, dibe ku yasa hundirîn be:

1) Filipîn bi karê yasayên Emerîka yên di 24ê Avdara 1934an de derçûyî diruşt bû.

2) Samanên(dewletên) Şahinşahiya Birîtanya bi

karê yasayên ji perlemanê Birîtanya derketî diruşt bûn.

• Dibe ku bi karê peymanên navdewletî hin dewlet peyda bûbin:

1) Êrlanda azad bi karê peymanê Ingilîz - Êrlanda di 6ê çilê pêşî ji sala 1921an de diruşt bû.

2) Welatê Endonêsyayê hevgirtî bi karê rêkeftinên Nêzerland(Holenda) - Endonêsyayê di 25ê Avdara 1947an de û 2ê Çiriya Paşî ji sala 1149an de çê bû.

3) Dewletên Îmaratên Erebi yên hevgirtî, Qeter û Behrên bi karê rêkeftinên navbera Birîtanya û Mîrnişînên Kendava Erebi de, di nava her dû salên 1971 – 1972an de diruşt bûn.

4) Bi karê rêkeftinên ku dewletan bi herêmên di bin deştîlat, serperîşt û paraştina xwe de girêdan, di dema navbera 1960 – 1995an de gelek dewletên nû di Asiya, Efrîqya û Emerîka Latîni de peyda bûn.

• Dibe ku biryarên Desteya Navdewletî jî, bûbin sedemê peydabûna pir dewletan:

1) Bi biryara kongirê Londin di 17ê Çilê Paşî ji sala 1912an de, Dewleta Elbanya çê bû.

2) Biryara Komela Giştî ya Netewên Yekgirtî ya di sala 1941an de derçûyî Şahnişîna Lîbiya çê bû.

Çarem: Rapirsîna giştî:

Gelek Dewlet bi rêya rapirsîna gelêrî peyda bûn:

1) Sûdan di sala 1956an de.

2) Xana di sala 1956an de.

3) Medxeşqer di sala 1960an de.

4) Kongo di sala 1960an de.

5) Êrîtîrya di sala 1993an de.

6) Tîmora Rojhilatî di sala 2002an de.

7) Lê Kurdiştana Îraqê, pir destdirêjiyên civaka navdewletî li hember kurdan û mafên wan yên navdewletê (rewa) bi tûndî aşkera bûn.

Jêder: Yasaya Navdewletî Ya Giştî

**Ji ber nexweşiya
KORONA Îsal Xelata
nemir Kemal Henan
hate rawestandî**



Di Roja Rojemegriya Kurdî de, Xelata nemir Kemal Henan dihat belakirin. Îsal, bi sedema nexweşiya KORONA, me ev xilat rawestand. Bi hêvî ne ku sala bê, em dîsa dest bi karê xwe bikin.

Komîta xelata Kemal Henan.

Fatima Dîya Şiyar

Zana Hiso

Nawaf Bishar Abdullah

Dîroka Hin Bêjeyan



Mihemed Qere Hesên

Kotî (Gotî)

Dîroka bêjeya kotî. Gava mirov li deşt, gelî û newalên çiyayê Zagrosê dijiyan, bi rojan re tenê ên çandiyê ji hev nas kir, û xwer. Ji wan **kait** nas kir. Ev bêje bi ji koka xwe ve Hindo- awrupiya derîn e. Bi navê tena **Gênimê** çolê hate nasîn. Jê nan bi navê geto hate çêkirin.

Bêjeya kotan(hevcar) koka xwe bi kurdî û Hindo Awrupî kot e. Ango birîne. Gava genim pale dikirin(tayê gênim dibirî), lê bi vê wateyê di zimanê kurdî pir bi karnehat, lê li ba Alman û Îglîzan cut(birîn) bi kartê.

Li ba Êzîdîyan pîr heye: wek ew kesê li ba Şêx kar dikin(keten). Navên pîrên kotan ji karê palê (birîn) hatiye. Ew ên pala(birîna) yek ji gênim, ku bibin jerjêgeha xwedê, ku qurban bi dawî bibe.

Di zimanê kurdî yê kevin de kotan birîne .

Ev bêjeyan wiha jê hatin kişandin:

Genim: pir xwerin jê tê çêkirin.

Kat: curekî şîrîniyê e.

Kulîçe: curekî şîrîniyê ye

Ka: Xwerina dewarane.

Gam (kam, kazmik): acetekê pê Sap dikutin.

Kadîn: cihê kayê dîkinê.

Kotan: hevcar e, pê çandinî tê kirin. Û li ba hin zarava bi navê cotariyan nas bû. Li ba hinan jî bi

kevirê mezin pê gênim dihêre nas bû. Gundek bi vî navî li herêma Efrînê heye(kotana).

Ev yek ji bêjeyên zimanê kurdî ya resen û kevnare, dîroka zimanê gotî (kurdî) vedigere heşt hezar sal B.Z

Ev bêje di pir zimanan tê dîtîn û li gor sîstema wî hatî riştin.

Em tev zanin ku dewleteke kevin bi navê gotî li Mizoptemiye û çiyayê Zagrosê hebû, û zimanê kurdî neviya zimanê gotiye.

Mêr (Merotî)

Ev bêjeya li ba Kurdên kaşî bi **martalash** wek xwedêyê cengê nas dibû. Ji navê Hindo- Arî **Mertofi** di **vîdiya** Arî ya Kuro de hatiye. Ta niha bi kurdî (Mer e) . Ew hesinê behin û ser tûj û bi serê çoyan ve dihate girêdan, di Vîdiye de wiha hatiye.

Mendel 2 (34).

1- Merotî, ey lêmişta bihêz û nerm.

2- Ew hespên xwe yên resen amade dikin

Bi pîroziya pîran

Hespên wan li rewan dikevin.

Wih, Merotî kesên leganên (paflagon, xozê)bi perên zêrî.

Ew ên bihêz cîhanê dihejinin

5 – Ey kesên merên (rim) xwevedibrûsin

Ew ên bi hev re û bi meraq, weke qazan diherin cihên xwe

Berve şahiya hingiv diçûn

8- Bes Merotî depên zêrî bi sîngê xwe ve girêdida

Hespan tev ereban berve serbilindiyêdikişandin

Çekên siwarên Kurdan wek ên xwediyên kevin mer û rimên zêrî bûn. Ji ber ku di wê demê de hê kanên din nizanîn.

Hemî amûrên cengê ji zêr çêdikirin. Kaşiyên wan zêr bi derdixiştin, li ba wan bi navê kaşî nas bû, û bi zimanê Sênsîkrîtî dibû qaş. Kaşmîr, li ba Kurdan du wate nîşan dide. Kaşî, zêr, navê kincan jî tê. Navê Kaşî ew kesên ku zêr bi derdixin û ronahiyê didin.

Ji titalên Kurdî – kotî, ku serên cegewerên Meryeno, gava diçûn cengê leganên(xozên) çêrimî didan serê, û bi qoçên ga dixemiladin .û di destên wan de pêtên êgir û dikirin borbor û bergên çêrimî li bejnên wan bûn û berpêş diçûn, ku dijminên xwe bitirsînin. Ev nerît ta dema kîyîxesroyê farisî ma bû.

Nerotî li ba Yonan û Roman bû Maris xwediyê cengê. Û meha avdarê pê bi nav bûye.

Di **Rîgevîde** wiha di çêroça xwe de li ser Merotî wek niştcihên çiyên hatiye.

Mendel 5 (54)

1- Komên Merotî, hûn xwediyê vebrûsek taybetin.

Ey ên miyan d i h e j î n i n 5 , ...

2- Mêrên weke

birûskan bi hêz, li kevran d i x i n

Bi hêz in, weke Bayan çiyên dihejinin.

11 – Mêrên(rim) Mer li ser piyan, û xilxal di lingan de

Depên zêrî li ser sîngê wan, û erebanên xemlandî.

Pêtên ji agir di destên we de, weke birûskê ronî didin

Li serên we kumên zêrî.

Bêjeya mêr îro bi wateya we kesê nêr Ku Ji zarokiyê bi derketiye û kanê zarokan wîne, Ji her Ku bi keçek dibêjin dema ya xwe mêrkirinê bûye. Mêrkirin ango şokirin. Gava mirovek kane zarokan wîne jê re dibêjin: Tu ne mêr î.

Mêr ew kesê ku temenê xwe gihîştî ku pirç li govndê wî şînbûye û kane û bi jinekê re şobibe û mera zêrî rake û here cengê.

Mer: Ew acetê ku serê xwe hesine û pê dor dar, mêtê û axê dikolin.

Bi zimanê Hindo- ariya kevin ciwan e, û bi êraniya kevin (Awişte) cengevane.

Êlên Keşiyên hezarê dudiye berî zayînê li çiyayê Zegrosê dewleta xwe ava kiribûn.

Di meha avdarê de li rex cejna Newrozê bi cejna netewî ya din bi navê vira (cejna mêrê mêran). Ango mîrê mîran, ew vir sê rojan diêj dike, ta niha herêma Mokriyan pê şa 19

Oxir be

Ji bo giyanê Mustafa Kalo

Husên Hebeş

Oxir be Ey Miçoyê dilê kaniya Şiyê

Min nizanî ku jiyan mistek ax e.

Min nizanî ku mirin ewqas bilez û bez, ber bi giyanên pakrewanan ve tê!

Min nizanî ku jiyan çav vekirineke, çav girtineke.

Min nizanî...!

Wê kenê te yî bilind û ji kûraniya dil de hertim di guhên me de bimîne. Wê dilpakiya te hertim di ramanên me de bimîne.

Wê hez kirina te hertim di dilê me de bimîne.

Wê ciwanmêriya te jî hertim bimîne û ticarî ji bîr


nabe.

Min dizanî ku tu aram nabî û tebat jî nakavî hinava te ku tu ne li nav axa bav û kalan bî, û termê te jî venahese ku ne li mezê Şiya giran û biha be.

Oxir be lo Oxir be ...Ey Miçoyê dilê kaniya Şiyê.

Min nizanî ku jiyan

mistek ax e lo Min nizanî...!



Dîroka hin ... Dûmahîk dibin.

Ev bêje di piraniya zimanên Hindî – Awrupî de heye, merot, merî, meryene, mêrotus, mêror,...

Kurmanc (kur – man – cih)

Di tîtalên Hindo – Ewropî kuro de, Man kurê Vîvavasvarte ye- şana ronahiyê ye- xwedêye royê ye, bi ronîya ji ezmên ve li ser zemînê nas dibe.

Li ba Somerîyan Anok xwedêye ezmên e.

Man serwerê ezbetî ye. Mirovê yekê ye di pişt lehiya mezin re pariştîye, û wateya xwe jî ewê di piştî lehiyê re maye, û bûye bapîrê mirov. Birayê wî cêwî Yem ê yekê miriye, û bûye şahê miriyan.

Ezbetên Mende yên li çiyayên Zegros dijiyan di jêderên Somerî û Ekedîyan de ber 23ê serdeman B.z li ser nivîsî bûn, û pişt re di zagonên Hêtîtan de li ser çalakîyên wan ên leşkerî nivîsî bûn. Tê xuyan ew bi xwe Hêtîtan bûn.

Di Rêgevîde de hin

çêroçik li ser hatine.

Mendele 10, 84(ji Men re)

1- Bi te re di erebanekê de me dijmin herifand

Şiyar e, tu dilewerî

Maryts bi rim û çekên xwe yên tûj li dor te ne

Bila mêrên bi çekên agir êriş dijmin kin.

2 – Man tu weke bi serketî wan bişewtî ne

Ey serketî, ku tu ji me re bibî serwer

Kînga dozî te kirin, dijminan bikuje û dewletên wan belav bike

Ez hêza te zanim, ku tu dijmin şerpeze dikî !

3- Man ji bo me here !

Ku dijmin hilweşîne, biherifin, bişkîne

Êriş dijminê xwe ke

Qet bi sernakevin û nikanin hêza te ya gewre rawestînin

Tu fermandarî,

Tu wan dikî bin destê xwe,

Tukes ne wek te ne

Li ba êraniyên cirmanî (Alman, Denîmerkiyîn, Înglîz), Mano weke bapîr pereştîya wî dikurin. Ji ber

ku Mano weke pabîr di efsanên Afîste û Rîkevîde de, ji gelên cirmanî re, ev xwedê ji zagrosê derbas gundokoşê (Hindokoşê û Awrupa) bû.

Kurd bi zimanê kurmacî(kurmaciya bakur, kurmançiya başûr) dipeyvîn, û êlek bi navê Mande jî heye. Kur man cih, û herêmek kurdiştanê bi navê Çiyayê kurmênc heye. Ango ev cihê kurên Man e(kurmanç), welatê neviyên Man e.

Li ber vê raştîya dîrokî – Etnogirafiya ku di hin çêroçkên Rîkevîde de, nêrîna Etnogirafiya ezbetên kurdî nîşan dide.

Rîkevîd. Mendel 1.

Çêroçik 44 (ji agir re)

11 -Ji bo qurbanê em te dilivînin,

Ey agir, weke mirudan, herdem qurbanin,

Weke berê di serdema Meno de,

12- Gava serwerê xwedêyan bû,

Weke Mître gewre ye,

Weke pêlên Sendîxo(çemê Diyele ye) bideng

in...

Rîkevîd, Mendele 60, 111 (ji Reybix re)

3- Reybîx# doştaniya Îndire vexwer,

Neviyên Mano bi rêketin.

Ewê ku tîr û erebane li ba Horî – Mîtaniyan çêdikirin, û bû bapîrê Hindo- Ariyên gelê Asiya bi çûke.

Bi destê ezbetên Kotî yên kevin kişwerek bi navê Mana avakirin, ew jî bûn jêderên bazirganiya ceh û gênim, ew têkiliya bazirganî di pirtûka pîroz heziqyel (27:1,2,14,17) de hatî nîşan kirin.

1- Xwedê bi min re got:

2- Û tu ey kurê ademiziyad, lorînek li ser wêneyan bixwînî

14- Niteciyên Tucreme kelûpelên te bi hesp, mehîn û qantiran guhartin,

17- Mala Yehoze û Îsraîl bi te re bazirganî bi genimê Mînit kirin .

Di dîroka berî zayîne de pêximberêk bi navê Manî bi derketibû.

/Dumahîk heye...

Ez ê Vegerim Cengeke navxweyî

Osman Îso

Veger dermanê dila ye, dûrbûn derdekî bela ye û deştar e, şahiyên dihêre, dem cercere; sapê laşê me hur dike, û roj bêdera temenê me li ber bayê toz û telaza dûrbûnê liba dike, û piştta me ji êşan xûz dike, û porê me ji qisawetan kal dike.

Çav li rê ne, tasûm herdem amade ne, li pê ne. Di quncêkî çadirê de tîrêjek ji ronahiya heyvê di qulekê re xwe dişimitand quncikê tarî û li ruyê Azêd dibû rik û liv, û semaya xwe li gorî ba û bahoze derve li saz dixist, geh ruyê çepê bi lêvan geş dikir, û geh ruyê rastê bêhn dikir û dişimitî ştuyê Azêd bi pişkovan re daxivî û ji nû ve hildikî jor û rû ji xwe re dikirin mitêl, û nivîn û fêrmiskên azêd dikirin orxan. Azad li cihekî din bû, li semaya biskên ronahiya Heyvê ne haydar bû, bêdengiya şevê û êşên xwe di quncikê tarî de hembêz dikirin û rewşa Efrînê dar bi dar, rê bi rê, gelî bi gelî, ça bi ça, kevir bi kevir û zêtûn bi zêtûn di pêş çavên wî re melûl, lê pêdar derbasdibûn, û cengeke navxweyî di navbere hiş û dil de gur dibû.

Azêd bi xwe re digot: Ez ê vegerim mala xwe, gundê xwe, nav darên zêtûnê. Lê eger ez vegerim û wan ez binçav kirim û goştê min hêdî hêdî hil kirin. Bila çî dibe bila bibe, - Ev ne ti gotine birayên min, hinek hatin kuştin û hinek hatin surginkirin, çawa ez ê vegerim?! Belê mal û milkên me namûsa me ne, divê em mala xwe sêwî nehêlin û berevaniya bîranînê bav û kalan bikin, lê çawa û em bê pişt in û bê çekên giran in û mûşekên li dijî balafirên em di şer de ne tişt in. Eger ez vegeriyam, ûştê darên zêtûnê û dîwarên bav û kalan biparêzim û ez ne xwedî hêz im, û ev ên teres hatin û qurşîn kirin serê min û mala min li pêş çavên min talan kirin û darên zêtûnê birrîn û bar kirin û ez nikanim tiştêkî bikim, wê çaxê ma mirin ne baştir e??. Belê rast e, lê eger her yek wisa birame, tikes venagere û çiyayê Kurmênc wê ji Kurdan vala bibe, û dagirker va yekê dixwazin!.

Ew dixwazin ta rûyê sirûştê biguhêrin, ji ber vê yekê jî, şûnwarên dîrokî topbaran dikin, çiyên dişewitînin û darên kevnar dibirrin û hil dikin. EFRÎN

ji berê de cihê wekhevî, hezkirin û aramiyê ye, û cihê xwandin, rewşenbîr, xebatkar û stranbêjan e, loma ew hovên xwînîmîj dibîstanan armanc dikin, bijîjkan bin çav dikin, stranbêjan zîndan dikin, û bi her awakî dixwazin te surgin bikin, cilûbergên Kurdî (şewler û şemla sor û fîstanê Kurmancî), hovîtiya wan gur dike. Ji ber va yekê dayîk û bavên me dikujin....Yan mayîn û mirin, yan tu wê dilê xwe li şûna xwe bihêlî û bibî rêwî û penaber!. Belê, eger ez vegerim dilê xwe EFRÎN, çawa ez ê bijîm? Li kolanan û aşkere ew bê şerm û fedî, û li pêş çavên leşgerên Tirk ti peran di berîkan de nahêlin, yan otombîlên bombekirî diteqînin. Ser van kul û derdan de, kar hemû rawestîne. Yanê li dawiyê, yan te dikujin an jî te dişelînin û kesek berevaniya me nake û eger ez mirim jî, kesî ne xeme (ha mirovek mirî ha kûçikek mirî) vêca ji bo çî ez ê vegerim?. Ji bo dîwaran biparêzim û rûmeta xwe jî erzan bikim?! Her tişt hat talan kirin, bes rûmet maye û eger yek gotinekê bi min re bike yan silekê li min xîne, ez ê ji qehra re



bimrim. Kuro! Tu çî dibêjî RÛMET!! Gotin!! Sîlek!! Ma bê mal û bê war û bê bîranînê zaroktiyê û bê hevalbend û bê pişt, ax ax bê welat rûmet heye? Rast e, yanê mirin tim mirin e. Eger em çiqas bijîn dawiya me mirin e û jixwe berê em mirine, her rojek bi salekê ye, û her roj em têne kuştin û bi girî em têne şuştin, û bêtirî deh salan ketine ser temenê me, û ji hundir û derve ve em kal bûne û axaftinê me lal bûne, dûrbûn ji mirinê xerabtir e, yê dimire vedihese, lê yê xwaş û mirî, derdê wî zorigiran e.

Ez ê vegerim, Na na ez venagerim, na ez ê vegerim, bi Xwedê ez venagerim. La bi tirba dayîka dilovan û bi axa pîroz ez ê vegerim û çî dibe bila bibe û eger ez mirim bila li ser axa bav û kalan ez bimirim, ez ê vegerim.



Ziman û ... Dûmahîk

Kurdî, nivîsandin û belav kirina Kurdî pêwîst dike ji wan re bibe ocaqek. Eger ew ocaqe neyê parastin,

hîngê ew miletparêzî bê havil e, gozeka fiş e. Di xebata me ya partiyê de, têye bîra me ku xwendin û nivîsandina Kurdî

di rêya kovarekê re, wekî Gelawêjê, ji me re hilatina rojê bû, hêvî bû, hêviya azadiya Kurd û serxwebûna Kurdistanê

bû. Em dikarin bibêjin ku civînên partiyê xweyîkirina dara xebatê bû, kurdî jî, çî xwendin, çî nivîsandin, berê xwe bû.

**Endamên Desteya NEWROZê yên ku ji nav me bar kirine
Ew jibîr nabim!**



Kemal Henan



Edîb İbrahim



Diljar Seyda



Mustefa Ellaş

Ziman û Newroz

Mamed Cimo

Di jiyana û dîroka miletan de, ziman 'ezman e. Herdu gotin ji me re nîşan didin ku zimanê mirova asîmanê mirova ye, banê xwe ye. Banê mirova dayîk e, li merivan dibane, hez dike. Wiha ziman miletan sax dihêle. Zimanê me yî Kurdî nimûneka diyar e ji wê raştiyê re.

Li aliyê dinê, ziman aliyê maderî yê hişmendiya miletekî ye, wate aliyê xwe yî manewî ye. Ev aliye mahîname miletekî ye,

pergala wî ye, rewanê wî ye. Di vir de, em dibînim ku Weşana Newrozê û xûşkên wê wiha girîng in, ji ber ku, wekî em dibînin, rihê Kurdîtiyê û Kurdiştanbûnê ne. Ev gotinên me yên jorin tenê tisî ne, bi rewşa niha ya Newrozê û kovarên Kurdî ve ne girêdayî ne. Newroz Weşaneke Kurdî ye, Kurdî zimanê Kurda ye; Kurd welatiyê Kurdiştanê ne. Ev niştîmanê li talankerên bêgane û hov hatine paymal kirin. Azadiya Kurd û serxwebûna vî

welatî ji dagîrkeran re xeternak e. Ji ber wê jî, sedsalek e zordarên welatê me yî parve kirî şerrê tunekirin ji xwe re kirine siyasetmedarî, rêç, armanc, û sedemên dirêjkirina dewletên xwe.

Wergî, li ber çavên me ron dibe ku Newroz û kovarên dinê yên Kurdî gulên ku xwe ji bin çiyayên zordariyê derdixînin. Vêca, Newroz nîşana berxwedanê ye, çiqasî ew tîre stûr bibe, gurr bibe, xurt bibe, were xweyî kirin, xwe li



armancê bigre, Kurda bixe bin asîmanê xwe, xwe ji Kurda re bike avsûna hişmendiyê, mejiyekî Kurdperestê jê çê bibe, ewqasî metirsî û xetera ku ser Kurdîtiyê û Kurdiştanbûnê ku heye dûr dikeve. Wiha, em dibînin ku hebûna Newroz û kovarên Kurdî xebateka milî ye, li ser piştî milet dikeve. Heçî kom û rêxistin û partiyên ku xwe miletparêz bibînin, rûpelên kovarekê bi 19

Pîrozbahî

Bi hatina 88-emîn salvegera derçûna Kovara HAWARê, ku bûye Roja Zimanê Kurdî,

Weşana NEWROZ gelê Kurd, hemû rewşenbîr, nivîskar û xwendevanên bi zimanê Kurdî pîroz dike.



Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re, yê di girtîgehên Sûriyê de